Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1369 19-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Bi deng û saza xwe dibe dengê civakê






Solîn Mihemed / Qamişlo

**Sazvan û stranbêjê ciwan, Mihemed Ebdo ku bi navê "Huner" tê naskirin, bi rêya muzîkê û stranên xwe hestên xwe derdixe. Ew bi taybet stranên Kurdî dibêje û bi amûrên cuda yên muzîkê weke tembûr, ûd û gîtarê stranan saz dike.**

Di demekê de ku li tevahî Kurdistanê, bi taybet li Rojavayê Kurdistanê, huner û stranbêjî di nava ciwanan de bûye hêzek ji bo parastina nasnameya gelê Kurd, dengê Mihemed jî wek beşek ji vê xebatê tê dîtin. Ciwan bi dengên xwe ne tenê huner diafirînin, lê herwiha dibin dengê civakê û di ber xaka welatê xwe de têdikoşin.

Mihemed Ebdo 26 salî ye û ji Kobanê ye, ji zarokatiya xwe ve hezkirina wî ji muzîkê re mezin bû. Wî di dawiya sala 2018'an de dest bi fêrbûna amûrên muzîkê kir û bi hewldanên xwe û alîkariya malbata xwe bi taybet birayê xwe, fêrî tembûrê bû. Di malbata wî de 6 kes hene û hemû ji muzîkê hez dikin. Ev atmosfera hunerî bûye sedema ku Mihemed bi lez nêzî muzîkê bibe. Wî xwendina xwe ya refa 12'an di sala 2019'an de qedand, niha jî li zanîngeha Kobanê di beşa mafnasiyê de xwendina xwe didomîne.

Her çend Mihemed heta niha negihîştibe daxwazên xwe yên mezin, lê ew bi domdarî li ser xwe dixebitîne. Niha ew zêdetir li ser stranbêjî û lêdana amûrên muzîkê dixebite da ku bi dengê xwe û berhemên xwe yên Kurdî bêtir balê civakê bikêşe.

Mihemed ji hunermendên navdar wek Teyar Elî, Seyda Perînçek, Mem Ararat û Ciwan Haco îlhama xwe digire, û ji zarokatiya xwe ve bi guhdariya stranên wan mezin bûye. Ew hêvîdar e ku rojekê bibe yek ji wan dengên ku di dîroka muzîka Kurdî de cih digirin.

Di gotinên xwe de, Mihemed Ebdo wiha dibêje :"Daxwaza min e ku ez rojekê bigihêjim asteke bilind û berhemên xwe yên taybet biafirînim, û xwe bi awayekî cuda di mûzîkê de nîşan bidim."

Bi vê armanca xwe re, Mihemed di rêya hunerê de gav bi gav pêşve diçe, bi hêvîya ku rojekê dengê wî ne tenê li Kobanê, lê li hemû Kurdistanê were bihîstin.

Gotina Dawî



Mihemed Seydi

## Naveroka entegrasyonê

Piştî şerê li taxên Şêxmeqsud û Eşrefiyê, pêvajoyekî nû ji bo Kurdan li rojava dest pê kir. Bi vê pêvajoyê re vekşîna ji Tebqa, Reqqa, Dêrazorê û bendava Tişrînê çêbû. Piştî wê, û bi yekgirtina gelê Kurd û helwesta wan, peymana 29'ê Çile hat îmzekirin û li gorî vê peymanê jî entegresyonê dest pê kir. Heta niha xalên vê peymanê nediyar in û nexuyaye ew ê rewş ber bi ku ve here. Tevî ku beriya wê peymana 10'ê Adarê jî hebû, lê me dît çawa êriş li ser Kurdan pêk hat. Gerentorên vê peymana 29 Çile û 10'ê Adarê ger ji hev cuda bin, dibe ku mirov bibêje peyman jî û nêzikbûna jê re cudan ne, lê ger yên serpereştî heman bin, ew ê çarenivîsa peymanan jî heman be.

Di nîvê meha Nîsanê de, Fermandarê QSD'ê Mezlum Ebdî û berpirsa Dîplomasiya Kurdan li Şamê bûn û bi serokê HTŞ'ê Ehmed El-Şerie ( Ebû Mohemed El-Colanî) re civiyan. Encamên vê civînê tiştek nehat gotin û tenê ji şiroveyên çavdêran re hat hiştin. Hinek şirove dibêjin ku ew ê hikumeteke nû çêbibe û wê wezîrên Kurd tê de cih bigrin û hinek jî dibêjin ew ê wezareta Karê derve bidin Kurdan û hwd.

Lê li gorî agahiyan, tiştekî bi vî awayî nehatiye nîqaşkirin û mijarên zêdetir hatin nirxandin ew in dosiyên aliqî û bi astengî yên Êsîrên Kurd û vegera Kurdên bi darê zorê hatine koçberkirin bûn e. Serokê HTŞ'ê daxuyaniyek da ku mijara entegresyona leşkerî bi dawî bûye, lê ji rêveberiya QSD'ê heta niha tiştek derneketiye. Gelo pêvajo gihiştiye ku û çawa bi rê ve diçe, ji bo xelkê ne diyar e û agahî tune. Ew ê pêşeroj çi be û ew ê rû bi rûyî çi bin, ew jî ne zelale. Lewma, wê baştir bibe ku ne şirove, lê agahî bi milet re werin parvekirin ka rewş ber bi ku ve diçe.

Herwiha dosiya ku Kurd niha herî zêde pê hestiyar in, ew e dosiya bi sedan zarokên wan ên dîl ketibûn destê desthilata demkî ya Şamê de. Mirov dema bala xwe bide vê dosiyê û meşandina wê, dibîne ku di derengxistina berdana ciwanên Kurd e, niyeteke ne zelal heye. Ew dixwazin li beranberî van Êsîran, zêdetir tawîzan ji Kurdan bistînin. Yanî, ne wekî ku dibêjin ew û Kurd di welat de şirîk in, lê dibînin ku ew û Kurd di welat de dijmin in. Ger niyet û fikir ne ev e, wê demê çima ev herdû dosiyên sereke yên Êsîran û vegera Koçberên ji Efrîn û Serê kaniyê hîne çareser nebûne û çima ciwanên Kurd ên vegeriyane Efrînê di bin navê lêpirsînê de tên binçavkirin? Ji bo miletê Kurd zanibe çawa tevbigere û ji bo rewşê tedbîran bigre, divê haya wî ji naveroka civîn û peymanan çêbibe û ev jî ne şerte bi riya ragihandinê be, dikare bi riya tevgerên Civakî pêk bê.

## FERHENGA BIWÊJAN

LI SER DERSGIRTINÊ

**Bila ev jî daxek be li destê min be:**
- Bila ev jî ji min re bibe ders.

**Da bizane dew birayê mast e:**
- Da careke din wisa neke; da dersê jê bigire; da bizane ku jê re namîne.

**Daxek li destê xwe da:**
- Bila ev jî ji min re bibe ders.

**Dersa xwe girt:**
- Tişteke wisa jê re hat gotin, (yan jî tişteke wisa pê hat kirin) ku jê re bibe ders.

**Dersa wî dayê:**
- Bi heman wateyê.

**Heta pirê tê birê nade ser pira Cizîrê:**
- Heta ew bûyer li bîra min be ez wir ve naçim.

**Lingê dîk di nava tasê de tîtiye:**
- Tirsiyaye; dersa xwe girtiye; êdî tişteke wisa nake.

**Li ser dûvê xwe rûnişt:**
- Êdî dengê xwe nekir; êdî tiştek nekir; dersa xwe girt; weke kûçikan bêdeng bû.

(Dema yek ji yekî ne xweş be jê re dibêje)

**Rûnişt ser dûvê xwe:**
- Bi heman wateyê.

**Li ser teriya xwe rûnişt:**
- Bi heman watey.

**Xişîna mar dît ji ya werîs reviya:**
- Ji tiştên wisa tirsiyaye; tiştên wisa bi serê wî hatine ji ber wê ditirse.

**Xwêya xwe xwar:**
- Êdî dengê xwe nekir; êdî tiştek nekir; dersa xwe girt; weke kûçikan bêdeng bû.

**Yê mar gez kirî ji werîs ditirse:**
- Ji tiştên wisa tirsiyaye; tiştên wisa bi serê wî hatine ji ber wê ditirse.

**Yê mar pê ve dayî ji werîs ditirse:**
- Bi heman wateyê.

LI SER GEŞ, GURR Û GERMKIRINÊ

**Defa hawarê ye:**
- Mirovan geş û gurr dike; mirovan dixe êrişê.

**Fit danê:**
- Germ kir; bû sedem ku êrîş bikiyê.

**Germ kir:**
- Dijwar kir; xist nava liv û tevgerê.

**Pif kir serê wî:**
- Germ kir; fît danê; lê sor kir; pîj kir; wisa kir ku wî karî bike; xist nava liv û tevgerê.

**Pifê pozê wî kir:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



Bi kamîreya Ayşa Silêman

## Meşa 19'ê Nîsanê: Bilindkirina dengê jinan bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo




Aktîvîsta Tevgera Jinên Azad (TJA) Hawa Can û hevseroka Dem Partiyê ya Batmanê Songül Demir diyar kirin ku armanca meşa 19'ê Nîsanê ya ku wê li Gemlîk a Bakurê Kurdistanê bê lidarxistin, azadiya Rêber Apo ye, ji ber bêyî Rêber Apo pêvajo nayê meşandin...**R-4**

## Piştî 7 salan vegera koçberên Serêkaniyê rojev e



Endamê Komîteya Koçberên Serêkaniyê Mihemed Haco diyar kir ku di çarçoveya pêkanîna Peymana 29'ê Çileyê de, vegera koçberan yek ji rojevên sereke ye, ji bo vegera koçberên Serêkaniyê jî, divê tiştên bingehîn ji koçberan re bên dabînkirin, çete û malbatên wan ji bajêr bên derxistin, hêzên ewlekariyê ji bajêr bi xwe bin û nabe kesên ji derve wê bi rê ve bibin.**R-5**

## Gelo dixwazin careke din DAIŞ'ê zindî bikin?



Çawa ku di sala 2014'an de bi destê hin hêzên herêmî û navnetewî DAIŞ bi serkêşiya Ebû Bekir Elbexdadî hat avakirin, niha jî heman sînaryo li Sûriyê û Iraqê bi serbestberdana çeteyên DAIŞ'ê û cihgirtina wan di nava artêşa Sûriyê de, tê dûbarekirin.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1369 19-Nîsan-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# 'HEVGIRTINA PARTÎ Û GELÊ KURD PARASTINA MAFÊN REWA XURTIR DIKE'

Sekretêrê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriye Ciwan Siko destnîşan kir ku hevgitina partî û gelê Kurd wê bibe bingeha bidestxistina mafê netewî, siyasî û çandî. Ji ber ku hevgirtin wê hêza parastina mafên rewa xurtir bike.**R-6**




## Roja Mîrateya Cîhanî… Gelek cihên mîratî li ber xeteriyê ne



Her sal di 18'ê Nîsanê de Roja Mîrateya Cîhanî tê pîrozkirin, ev roj derfeteke girîng e ji bo zêdekirina hişmendiya li ser cihêrengiya mîrata çandî ya gerdûnî, herwiha pêwîstiya parastina wê.**R-11**

## Ji bo dabînkirina nan hewildanên rêxistinkirina nangehan berdewam e



Hevserokê Komîteya Nangehan ya kantona Cizîrê Rondar Salih destnîşan kir ku gerên wan ji bo şopandina nangehan û kalîteya nan berdewam dike û got, "Mekenîzmeya proseya çêkirina nan di bin çavdêrî û şopandinê de ye, da ku li gorî pîvanên ku tê xwestin bighêje ber destê gel."**R-8**


Bedêlên herî giran jin didin
Berîtan Xalid R-2


Bi Şêwazên Nerm Kiritîna Axa Sûriyê Dewam Dike
Idrîs Henan R-4


Ji vî şerî dê aştî derkeve?
E.Pêjder Altan R-6


Xwendina bi komî
Remezan Olçen R-9

# Hewesa bedewiyê polîtîkayeke sîstematîk ji aliyê pergalê ve li ser jinê ye (2)

Esma Mistefa

**Bandora nişterkariyên xweşikbûnê li ser jinan**

Tevî belavbûna berfireh a nişterkariyên xweşikbûnê di nav jinan de di serdema nûjen de û tevî xeteriyên wan yên tenduristî û nexweşiyan, lê ev diyarde xwediyê encamên neyînî di aliyê pîskolojîk, tenduristî û civakî de ye jî.

Ji aliyê tenduristiyê ve, tevî pêşketinên girîng ên teknolojîk, nişterkariyên xweşikbûnê bê rîskên bijîşkî nîne. Dibe ku hin jin bi tevliheviyên wekî kulbûn, xwînrijandin, an têkçûna emeliyatê re rû bi rû bimînin ku ev yek hewceyê mudaxeleyên din e ku dikare tevliheviyê zêde bike. Di hin rewşan de, xeletiyên bijîşkî dikarin li şûna baştirkirina xuyangê bibin sedema xirabûna mayînde. Di warê psîkolojîk de, pirsgirêka nerazîbûna berdewam ji fîzîk û şeklê xwe pir derdikeve. Hin jin bawer dikin ku ev emeliyat dê baweriya wan bi xwe zêde bike, lê rastî dibe ku cuda be. Ev dikare bibe sedema zêdebûna pêkanîna emeliyatên dubarekirî ku wekî "hewesa xweşikbûnê" tê binavkirin.

Ji aliyê civakî ve, emeliyatên xweşikbûnê dibe sedema pêşxistina pîvanên bedewiyê yên nerealîst (ne rast, ne heqîqî), û zextek zêde li ser jinan çêdike ku li gorî van pîvanan tevbigerin. Emeliyatên xweşikbûnê dikarin ji hilbijartinek kesane veguherin "pêdiviyek civakî" ya ferzkirî bi taybet di nava hin kategorî û hawîrdoran de.

**Bandora van nişterkariyên xweşikbûnê di aliyê aborî de**

Di cîhanê de hatiye piştrastkirin ku lêçûna bilind a nişterkariyên xweşikbûnê yek ji mezintirîn zehmetiyan e, û hin kes ji bo peydakirina lêçûnan û pereyên wê serî li deynkirinê didin an jî pereyên xwe yên ji xwe re dane aliyekî xerc dikin. Û ev bi emaliyeta yekem bi dawî nabe; gelek emeliyat gelek rûniştinan hewce dikin ku di demek dirêj de lêçûna giştî zêde dike.

Pispor her wiha hişyariyê didin li ser lêçûnên zêde yên ji ber tevlihevî an xeletiyên bijîşkî ku di encama neserketina emeliyatê de derdikeve, dikarin barê darayî yê kesekî hîn zêde bikin. Di rewşên din de, hin kes neçar dimînin ku ji bo başbûnê betlaneyê ji kar bigirin ku ev dibe sedema hîn zêde ya windakirina dahatê.

Ev xerckirin dibe ku bandorek neyînî li ser giştî rewşa aborî û darayî yên kesan bike, ji ber ku emeliyat û dermankirinên bedewiyê li ser pêdiviyên bingehîn yên jiyanê û mirovahiyê têne hilbijartin.

**Nişterkariyên xweşikbûnê di nava kesên temen biçûk de**

Bi belavbûna berfireh a nişterkariyên xweşikbûnê li çaraliyê cîhanê, ev qad êdî ne tenê bi mezinan re sînordar maye, hîn zêde berfireh bûye û kesên temenê wan biçûkin (di bin 18 salî de) jî di nav xwe de digire ku ev yek di nav bijîşk û civakê de di aliyê sedem, xeteriyên wê, bûye mijarên nîqaşê yên herî girîng.

Amarên dawî nîşan didin ku ev diyarde heye, lê ew hinekî bi sînor dimîne. Li Dewletên Yekbûyî, nêzîkî 23 hezar emeliyatên xweşikbûnê li ser kesên di bin 19 salî de hatine kirin ku tenê nêzîkî sedî yek ji hemî nişterkariyên xweşikbûnê, temsîl dike.

Li gorî dane û lêkolînên dawiyê yên ku hatine derketin, li cîhanê hin texmîn nîşan didin ku dora ji sedî 15 niştekariyên xweşikbûnê li ser kesên di bin 19 salî de hatine kirin. Ev yek jî di demên pêş de xeteriya zêdebûna vê katagoriyê di bazara emeliyatên xweşikbûnê de zêde dike.

**Ji nişterkariyên xweşikbûnê yên herî zêde de nava vê katagotriyê de têne bikaranîn ev in:**

Sererastkirina poz ku bi qasî ji sedî 65 ji emeliyatên ku li ser ciwanan têne kirin pêk tîne, her wiha sererastkirina guhên berbiçav, dermankirina birîn û nîşanên pizrikan û hin emeliyatên ne ceraahî yên wekî Botox û dagirtin ku salane di nav ciwanan de digihîje sed hezaran bûyeran.

Çima keçên temenbiçûk serî li cihên emeliyatên xweşikbûnê didin?

Pispor bawer dikin ku sedem tevlîheviyek ji faktorên psîkolojîk û civakî ne, ji wan yên herî berbiçav ev in:

- Bandora medyaya civakî û pîvanên bedewiya "îdeal" bê kêmasî.
- Nerazîbûna ji wêneya fîzîka xwe dema nû dighîne.
- Zexta hevalan û civakê.
- Xwesteka zêdekirina baweriya bi xwe.



Tevî pêkanîna van emeliyatan jî, lê hatiye piştrastkirin ku ji ber her tim ev katagorê xwe bi wêne, dîmen û jiyana li ser medya civakî têne parvekirin re tîne ber hev du, hê jî ji şeklê xwe ne razî ne.

**Rêjeya giştî ya salane di cîhanê de çiqas nişterkariyên xweşikbûnê tên kirin**

Li gorî Komeleya Navneteweyî ya Cerrahiya Plastîk a Estetîk (ISAPS), salane li seranserê cîhanê zêdetirî 12 mîlyon emeliyatên xweşikbûnê li ser jinan têne kirin. Ji bilî nêzîkî 25 mîlyon emeliyatên xweşikbûnê yên ne birîndarî (wek Botox û fillers) tên kirin.

Hejmara giştî ya niştekariyên birîndarî û ne birîndarî salane bi qasî 37 milyon e.

Ev hejmar hemû temenan, tevî mezinan û zarokên temenbiçûk, dihewîne, lê zarokên temenbiçûk rêjeyek pir piçûk pêk tînin (nêzîkî 1-2 ji sedî ne).

Her roj nêzîkî 91 milyon jin an keç li seranserê cîhanê ji bo emeliyatên estetîkbûnê ango xweşikbûnê, çi bi birîndarî be çi jî ne birîndarî be, derbas dibin. Ev yek jî pirbûna belavbûna vê diyarfdeyê di cîhanê de dide diyarkirin.

**Dewletên ku herî zêde tê de nişterkariya xweşikbûnê tên kirin**

Li gorî hejmara nişterkariyê giştî û rêjeya belavbûna wê di nabva gel de, nişterkariyên xweşikbûnê li gel jinan ji her welatekî diguhere, lê belê bîrançoyên gilobal wêneyên herî zelal yên welatê herî zêde ku vê yekê bikar tînin dide me.

**Pêşî: Welatên ku herî zêde lê hatine kirin (hejmara giştî)**

Li gorî raporên Komeleya Navneteweyî ya Emeliyata Plastîk a Estetîk, welatên pêşeng ên cîhanê ev in:

1. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê 2. Brezîlya 3. Japonya 4. Îtalya 5. Almanya 6. Meksîka 7. Hindistan 8. Tirkiye.

Tenê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê salane zêdetirî 6 milyon emeliyat pêk tînin. Brazîlya jî di rêza duyemîn de ye.

**Duyem: Welatên ku "rêjeya" wan herî bilind e (di nav jinan de herî zêde belav e)**

Li gorî nifûsê, herî bilind li cîhanê Li Koreya Başûr, bi qasî 1 ji 25 kesan nişterkariya xweşikbûnê kiriye. Ew wekî yek ji welatên ku rêjeyên herî bilind ên "berbelavbûna çandî" ya emeliyatên xweşikbûnê li çaraliyê cîhanê hene, tê hesibandin.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Brezîlya di lîsteya welatên ku herî zêde emeliyatên xweşikbûnê lê têne kirin de di rêza yekem de ne, di heman demê de Koreya Başûr di warê belavbûna van emeliyatan de di nav nifûsa xwe de di rêza yekem a cîhanê de ye.

Her çendî sedem ji welatekî bo welatekî diguhere jî, xala hevpar daxwaza zêde ya jinan û veguherîna emeliyatên xweşikbûnê ji hilbijartinek takekesî ber bi diyardeyek civakî ya gerdûnî ya mezin dibe ye.

Ji Ramanên Jin



Bêrîtan Xalid

## Bedêlên herî giran jin didin

Bêrîtan Xalid

Di bin siya pevçûnên zêde yên li herêma Ereb û Rojhilata Navîn de, êşa jinan mîna yek ji qeyranên mirovî yên herî giran û tevlihev derdikeve pêş. Şer û pevçûnên çekdarî, êdî ne tenê pevçûnên leşkerî yên sînordarkirî ne; veguherî qeyranên berfireh ku dikevin nav kûrahiyên civakan, avahiya civakî û aborî parçe dikin û rolên kesan a di nav malbat û civakê de ji nû ve şêwe dikin. Jin weke şer û pevçûnên li Rojhilata Navîn di rewşa krîzan de jî bi êrîşan re rû bi rû dimînin. Di nava malbatên koçber de jin û zarok herî zêde bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin. Jinên Rojava ku para xwe ji krîz û kaosa ji ber şer derketiye girtine, li aliyekî li benda roja ku vegerin ser cih û warê xwe ne û li aliyê din jî têkoşîna jiyanê didomînin.Yek ji bûyerên civakî ku dibe sedemê şeran, koçên bi zorê, koçkirina ji welatekê ber bi welatek din ve û ji bajarekê ber bi bajarek din ve, ne tenê guherîna cihekê ye. Bûyerek ku di nava vê rewşê de, gelek metirsiyan dihewîne, jin û zarok bê parastin dimîne û zîncîra binpêkirinan bi xwe re tîne ye. Ji ber şeran bi milyonan mirov ketine rêyên koçberiyê .Beşên herî zêde ku ji vê pêvajoyê bandor dibin, jin û zarok in. Sedemên herî bingehîn ên koçberiyan şer û binpêkirin in. Ji ber şerên tê jiyîn û qadên pevçûnan qadên jiyanê tine dibin. Koç ne tercîhek e, ji bo bijîn, bi hêviya jiyanek nû ketina rê ye. Di qada şer de, qadên jiyanê, êrîşên li dijî xakên wan û gelek binpêkirinên mafan bi xwe re tînin.Piştî koçberiyê li welatên ku hatine, di kampên koçberiyê yên lê dimînin de rastî gelek binpêkirinên mafên mirovan tên. Di van rewşan de jî dîsa jin bedêlên herî giran didin. Kampên koçberan gelek qerebalix in. Ji xwarinê destpê bike gelek pêwîstî û xizmet kêm in. Di her qadên jiyanê de rewşên ku bibin sedemên krîzên civakî.Em her tim tînin ziman ku ev şerên ku tên jiyîn, ne şerên gelan, jin û zarokan in. Şer talan, mirin û komkujî ne. Pergala ku li dijî şer bisekine, jiyana demokratîk e. Avakirina jiyanek demokratîk ku hemû gel û bawerî di nava hev de bijîn, panzehîra şerên tên jiyîn e. Ji bo koçberiyên navneteweyî neyên jiyîn, jin û zarok di rêyên koçberiyê de nemirin û rastî krîzên cûda neyên, divê hemû ji vî şerî re bêjin 'Na', ji bo avakirina jiyanek kolektîf û demokratîk, rêxistinên girseyî yên demokratîk, hemû gelên dinyayê li dijî vê yekê dengê xwe derxin û ji bo bidawîbûna şeran elzem e. Em hemû ji bo pêşeroja zarokan û jiyana hevpar a jinan li dijî şer bisekinin û ji bo jiyanek bi rûmet em ê têkoşînê bidomînin.Pirsgirêka Kurd her tim bi polîtîkayên îmha, asîmîlasyon û ewlehiyê, rastî qadek şer û pevçûnan hatiye .Di wateya civakî, çandî û aborî de, me bedêlên giran dane. Destpêkê zorê dan ser wan ku qadên jiyanê biterikînin. Di salên 1990'an de bi hincetên ewlehiyê gund bi şewitandinê vala kirin, mirovên li wêderê dijiyan ji cih, xak û lawirên xwe bûn. Mirov bi neçarî ketin rêya koçberiyê. Gelê ku li wê derê dijiya, ji zimanê xwe, çanda xwe hate dûrxistin û bi koçberiyên zorî mehkûmê metrepolan hatin kirin. Di serî de zimanê dayîkê, li beramberî gelê ku ji nirxê xwe hatin dûrxistin, polîtîkayên tundî û asîmîlasyonê hatin pêkanîn. Xala ku îro hatine mirovên ku di metrepolan de dijîn û di heman demê de mecbûrî koçberiyê hatiye kirin, rû birûyî krîzên mezin û binpêkirinên mafan in. Di roja meya îro de jî ev pirsgirêk didomin.



# Roja Mîrateya Cîhanî... Gelek cihên mîratî li ber xeteriyê ne

Her sal di 18'ê Nîsanê de Roja Mîrateya Cîhanî tê pîrozkirin, ev roj derfeteke girîng e ji bo zêdekirina hişmendiya li ser cihêrengiya mîratê çandî ya gerdûnî, herwiha pêwîstiya parastina wê.

Navenda Nûçeyan

Roja Mîrateya Cîhanî, di sala 1982'an de ji aliyê Konseya Navneteweyî ya Abîdeyan û Cihên Dîrokî (ICOMOS) ve hate destnîşankirin û di sala 1983'an de ji aliyê Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO) ve wekî derfetek ji bo pîrozkirina mîrateya dewlemend a neteweyî û cihêrengiya çandî, bi armanca xurtkirina nasnameya neteweyî, nasandina nifşên nû bi mîrateya wan a çandî û bilindkirina hişmendiya civakê li ser girîngiya mîrateya çandî û xwezayî û parastina wê, ku berpirsiyariya ji bo pêwîstiya hevkariya navneteweyî û herêmî di parastina mîratê û misogerkirina têgihîştin û danûstandina çandî di navbera gelan de zêde dike, hate pejirandin.

**Mîrateya Cîhanî**

Roja Mîrateya Cîhanî balê dikşîne li ser zehmetî, dijwarî û gefên ku cih û abîdeyên mîratî pê re rû bi rû ne, ji karîsetên xwezayî bigire heya pevçûnên ku bi destê mirovan tê kirin di heman demê de girîngdayîna rêbernameyên ku di Peymana Venedîkê de ji bo parastin wan hatine destnîşankirin. Pîrozkirina Roja Mîrateya Cîhanî şahidiyek e ji bo naskirina gerdûnî ya girîngiya parastina mîrateya çandî ya hevpar e, herwiha bîranîneke ku şûnwar û abîdeyên Mîrata Cîhanî ne tenê xezîneyên herêmî an neteweyî ne, lê beşek ji mîrata hevpar a mirovahiyê ne.

**Şer û pevçûn dibin gef li ser Mîrata Cîhanî**

Şer, şoreş û pevçûn di her zemanekî de gef li ser cihên mîrateya neteweyî çêkirine, wekî ku vê dawiyê li Îran, Ukraynayê û Sûriyê hate dîtin. Lê niha xeterek cidîtir derketiye holê ew jî guherîna avhewayê ye.

Cihên Mîrateya Cîhanî ya UNESCO'yê, ji (Îhramat) Pîramîdên Misrê yên temenê wê vedgere 4 hezar sal berê bigire heta Peykerên navdar ku temenê wan dighêje hezar û 500 sal berê yên li Girava Îster, her ku diçe tên hilwişandin û li ber xerabûnê ve diçin.

Germahiya bilind, bahozên bihêz û hişkesalî bandorek neyînî li ser madeyên avahîsaziyê dikin. Li gorî lêkolînekê ku sala 2025'an hatiye kirin, nîşan dide ku ji sedî 80'ê cihên Mîrateya Cîhanî di bin zexta avhewayê de ne, ji ber ku madeyên avahîsaziyê yên pir kevn wekî dar û kevir nikarin li hember germahiyên bilind li ber xwe bidin.

Ji hin cihên ku mîrate li ber xeteriyê ne:

**Xaka Şaristaniyê…Zîgurata Urê li Iraqê**

Li naveresta herêmeke çolê, Zîgurata navdar a Urê heye, perestgeheke ku temenê wê 4 hezar sal berê ye, ku ji bo xwedawenda heyvê Nana hatiye avakirin. Avahî her ku diçe hildiweşe; qûmên guherbar û bayên bihêz gefan li bingehên wê dikin.

Di heman demê de, ji ber germahî û ziwabûnê ava binerdê her ku diçe şor dibe. Ev yek bandorek neyînî li ser kelpîçên heriyê yên vê perestgeha Mezopotamyayê dike(Welatê di navbera her du çeman de). Ev yek ji ber guhertina avhewayî tê pêkanîn, ku libên xwê dikevin nava madeyên avahiyê û di encamê de dibin sedema ku ew gav bi gav berfireh bibin û di dawî de wan hilweşînin.

Herwiha kavilên bajarê kevnar ê Babilê li ser Çemê Firatê jî di bin gefê de ne, ji ber ku asta bilind a şorbûnê zirarê dighîne bingehên avahiyê. Zanistên Arkolojîk hewl didin ku vê yekê, wekî nimûne kelpîçên heriyê yên kêm xwê yên ku bi rêbazên ku dîroka wan vedigere hezarên salan hatine çêkirin, bi kar bînin û pirsgirêkê çareser bikin.

**Mizgeftên Esfehanê li Îranê**

Di dema heyî de, şer gefek girîng li ser cihên dîrokî yên li Îranê çêdike. Lêbelê, guherîna avhewayê jî şopa û bandora xwe dihêle. Di nav cihên bandorbûyî de mizgeftên dîrokî yên Esfehanê hene. Mizgefta Înê (Masjid Jameh Atiq) pêşketina mîmariya mizgeftê di nav 12 sedsalan de nîşan dide.



© Michael Runkel/robertharding/picture alliance

Avakirina vê mizgeftê di sala 841'an de PZ dest pê kir û gelek caran hatiye sererastkirin û berfirehkirin. Li gorî UNESCO, ew wekî "Muzexaneya mîmariya Îranî" tê hesibandin. Bi saya qubbê wê yê bêhempa û xemlên xwe yên dewlemend, ev mizgeft wekî modelek ji bo avahiyên olî û perwerdeyê li seranserê herêmek fireh, ji Îran heta Iraq û Sûriyê, xizmet kiriye.

Li nêzîkî wê Meydana Îmamê heye, ew meydaneke mezin û berfireh e ku dîroka wê vedigere sedsala 17'an. Ji bilî tiştên din, Mizgefta Îmam a navdar, bi qubeya xwe ya şîn û xetnivîsa xwe ya hunerî heye.

Lêbelê, hemû avahiyên li Esfehanê ku li jor hatine behs kirin li ser erdeke nearam in, ji ber kêmbûna domdar a asta ava binerdê ya ji ber ziwabûnê, di bin avê de dimînin. Wekî din ji ber germahiya zêde û guherînên dijwar ên şilbûna atmosferê jî zextek zêde li ser avahiyan çêdikin. Di vî derbarî de UNESCO'yê hişyariyê dide û piştrast dike ku ev xirabûna hêdî, eger neyê kontrolkirin, dikare bibe sedema şikestin, bêîstîqrarî û di rewşa herî xirab de jî, hilweşînê.

**Peykerên Moai li Girava Îster ya Tişîliyê**

Li gorî lêkolîneke Zanîngeha Hawaî, peykerên moaiyê yên navdar ên li Girava Îsterê ya Tişîliyê dibe ku di nav çend dehsalan de bêtir di bin avê de bimînin. Cihê Ahu Tongariki, ku 15 peykerên mezin lê hene, wekî cihekî bi taybetî li hember xeteriyê ye tê hesibandin. Ji ber ku bilindbûna asta deryayê pêlên bihêztir û lehiyê tehdît dike, ku li gorî lêkolîna 2025'an, dikare ji nîvê zêdetir xezîneyên çandî yên giravê bixe xeterê.

Nivîskarê sereke yê lêkolînê, Noah Bawa, dibêje ku ev yek dê ji bo çanda zindî û debara xelkê li (Rapa Nui) wêranker be. Herwiha diyar dike ku ev cih ji bo nasname û kevneşopiyên wan tiştekî bingehîn in. Wekî din, geştiyariya li giravê pir bi wan ve girêdayî ye. Di heman demê de tekez kir ku heta bi statuya giravê wekî Cihê Mîrateya Cîhanî ya UNESCO'yê jî dikare di demek dirêj de bikeve xetereyê.

**Sûrê Çînê ê Mezin**

Sûrê Çînê ê Mezin ku dirêjahiya wê zêdetirî 21,000 kîlometre ye, yek ji nîşaneyên mîmarî yên herî berbiçav ên cîhanê ye. Sûrê Çînê ê Mezin ev zêdetirî du hezar salan e hatiye avakirin û berfireh kirin û ji sala 1987'an û vir ve di Lîsteya Mîrateya Cîhanî ya UNESCO'yê de ye. Lê ew jî di xetereyê de ye. Piraniya Sûrê Çînê ê Mezin ji axa zexm pêk tê, ku wê li hember ba, baran û depoyên xwêyê di xeteriyê de ye. Ev dibe sedema şikestin û hilweşîna muhtemel. Îro, nêzîkî ji sedî 6 dîwar di rewşek baş de ye, lê hema hema nîvê wê bi giranî zirar dîtiye an jî winda bûye. Lêkolîner ji bo parastina vê abîdeya cîhanî banga tedbîrên lezgîn dikin.

Ji ber vê yekê guherîna avhewayê ne tenê xwezayê, lê di heman demê de mîrata çandî ya mirovahiyê ku beşek ji dîroka gelan a hevpar tehdîd dike.



# Ji navdêrên Jinên Kurd; Qedem Xêr

**Zana Roj**

Qedem Xêr wek yek ji jinên navdar yên Kurd tê nasîn û wêneyek zelal a jinên Lor radixe ber çavên me. Qedem Xêr li ser tarîtiya ku bi ser dîroka Loristanê hatiye pêçan, dibiriqe. Herçend baş neyê zanîn jî lê ligor hin belgeyên ku bi zimanê Farsî hatine çap kirin, tê gotin ku Qedem Xêr ligor dîroka xurşîdî di sala 1278´an de hatiye dinya yê.

### Jineke wêrek û dilawer

Qedem Xêr jinek e dilawer, xweşik û têgihiştî bû. Di şerên qebîleyan de ji zilamên qebîleya xwe re pêşeng û piştevanî dikir. Dem bi dem, dema ku qebîleya wan rastê êrîş û dorpêça dijmin dihat, ew Qedem Xêr bû ku bê tirs di nav agir û dengê tifingên dijmin de ji bo rizgar kirina qebîleya xwe erzaq û alavên leşkerî digihand û gelek caran jî ev tevgera wê ya wêrek dibû sedem ku herkes jê hêz bigire. Tê gotin ku Qedem Xêr di sala 1278´ê Xurşîdî de, li çiyayê tengevan (ku dikeve milê bakurê Endîşmek û Lor) û li ciheke bi navê (gud) di şikeftekê de tê dinya yê. Navê bavê wê Qendî û ji qebîla mezin ya qelawend e. Bavê wê kesek nas, xwedî qedir û qîmet, her wiha berpirsê qebîleya qelawend bû. Navê diya wê Cewahir ku tê gotin xwedî taybetmendiyên bijarte bûye. Qedem Xêr xwedî 9 bira û xwîşkek bûye ku tê gotin ku ji wan Ebas Xan û Mihemed Elî li Loristanê wek kesên navdar û xwedî pirestîj dihatin nasîn.

### Esîmaneke geş û rewnaq

Qedem Xêr yek ji wan jinane ku di rêveberiya dewletê de cih digire û xwedî rol û mîsyoneke girîng e. Li Loristana ku dikeve bakurê Kurdistana rojhelat di demeke kin de nav û dengê wê bi dilawerî, wêrektî û cengawertiyê belav dibe. Qedem Xêr cihê birayê xwe digire û ji bo ku li dijî Şahê Iranê şerê azadîxwaziyê bide meşandin, ji artişê re rêbertî dike. Weke vî şerî di gelek şeran de serkeftinên mezin bidest dixe.

Ev çîrokek pirr kevin e û heya dema hikûmraniya malbata Pehlevî diçe. Hîn salên ewil yên hikûmeta Pehlevî bû ku hêzên leşkerî nû li herêma Loristan û Elvar bi cih bibûn. Armanca hatina wan a li vê herêmê zêde kirina zextên li ser eşîr û gelê xwe cihî bû. Her wiha ji bo serwerî û bi cih bûna hêzên dagirker yên wek Ingîlîsan a li vê herêmê; şikandin û dîl girtina gelên xwe cihî, ji bo wan yekane armanc bû. Ji ber vê çendê jî di navbera hêzên dagirker û qebîleya Qedem Xêr de ( ligor dîroka Xurşîdî, di sala 1313 heya 1320´an) şer destpê dike.

### Li dijî desthilatdaran şerê azadiyê

Di sala 1307-1308´an de (li gor dîroka Xurşîdî) hêzên artêşa Riza Xan êrîşê eşîrên pişt çiyayan yên Loristanî dike, lê eşîra qelawend weke eşîrên din yên li herêmê rê nadin ketina hêzên dewletê û êrîşên wan têk dibin. Û ev têkoşîn, wê navê Qedem Xêra Loristanî ku wek fermande û rêbera hêzên cengawerên Lor ku nêzî pênc salan li dijî dagirkeran têkoşiyan, bê bibîranîn û bikeve nav rûpelên dîrokê. Di vî şerî de Qedem Xêr tevî hevser û birayên xwe di çeperên şer de şer dike û di encama vî şerî de hevserê wê jiyana xwe ji dest dide. Lê tu tişt nedikarî li pêşiya Qedem Xêr ê bibe kelem, ji bo ku li dijî bê edaletî û mitîngeriya Riza Xan Pehlevî raweste, têkoşîneke man û nemanê dide meşandin.

Tê gotin ku Qedem Xêr piştî ku birayê wê jî ji aliyê Şahê Iranê we tê qetil kirin û şûnde di sala 1932´an de cihê birayê xwe digire. Ji bo bihevre bûn û yekitiya gelê Kurd hewldanên mezin dide. Her wiha di vê mijarê de gelek hewldanên wê jî çêdibin. Ji bo serweriya Şah têk bibe, bi xwe ji hêzên çekdarî re rêbertiyê dike û pêşengtiyê ji şerê azadîxwaziyê a li dijî desthilatdariya Şah, dike. Berxwedana wê a bê hempa wê bi xwe re serkeftinên mezin jî bîne.

### Destaneke bê hempa a wêrektiyê

Dema ku birayên Qedem Xêr di bin dorpêça hêzîn dewletê de dimînin û hem erzaq, av, hem jî alavên wan yên leşkerî bidawî dibin, Qedem Xêr çend kesên di bin fermandariya xwe de digire gel xwe, li ser pişta hespê siwar dibe û wek ba di nav dorpêça hêzên dewletê de derbas dibe, pêdiviyên heyî bidest dixe û birayên xwe ji dorpêçê rizgar dike. Berê tam bi cih bûn û istiqrara hikûmeta Pehlevî a li herêma Xûrem Abad û cihên din, nav û dengê têkoşîna Qedem Xêr û du birayên wê a li dijî hêzên di bin fermandariya general Isfendiyar de, li çar hêlên welat belav bibû û di her civatekê de li ser dihat axaftin. Cesareta ku Qedem Xêr di vê têkoşînê de dide nîşandayîn, awaza qehrimaniya wê li her deverekê belav dibe û wek destanekê li ser zimanan digere.

Bê goman ne tenê bi gihandina alikarî, her wiha bi şer û wêrektiya xwe jî li çar hêlên welat nav û dengê wê tê belav kirin. Tê gotin ku ji dûr û nêzîk, li gelek cihên welat gel ji bo vê jina cengawer a ku li dijî zilmê têdikoşe û zaliman têk dibe, bibînin dikevin ser rê. Gel li wir rastê xweşikbûna vê jina hêja û narîn dibin, sekna wê a wêrek bandoreke zêde li ser wan dide avakirin.

Piştî ketina Riza Xan û hêzên dewletê a li herêma Balagîrewê, qebîleya Qedem Xêr bi hêzên dewletê re dikevin nav şereke dijwar de. Qedem Xêr di vî şerî de bi wêrekî nêz dibe û qehremaniyeke bêhempa raber dike.

### Awazek li Loristanê bilind dibe

Di nav gelek kesên ku diçûn dîtina Qedem Xêr ê û ji bedewî, delalî û sekna wê bandor dibûn, muzîkjen, hunermendên herêmî û gerok hebûn. Yek ji wan kesan ku diçe dîtina Qedem Xêr û jê bandor dibe; ji xwe ji ber vê jî helbestekê dinivîse û stranekê



çêdike, Murad Beg e. Ji xwe pişt re wê ev stran wek yek ji miqamên muzîka Lorî a bi nav û deng bê te nasîn.

Berovajî gelek jinên eşîrî ku bikaranîna çek nedizanîn û sûwar nebûn, Qedem Xêr pirr baş çek bikartanî û hem jî sûwareke biqabiliyet bû. Li ser Qedem Xêr gelek helbes tên nivîsîn û stran tên gotin. Yek ji wan helbestan jî ji aliyê Mela Cemşîd ku stranbêj û helbestvanê qebîleya Qelawend e, hatiye nivîsîn. Di gelek beytan de behsa wê dike û di derbarê wê de straneke pirr xweş çêdîke, xwe jî bi kemançeyê vê stranê dibêje ku ev stran heya roja me ya îrov hatiye. Li Loristanê, ji berê heya roja îro, gelek kilambêjan strana Qedem Xêr ê gotiye. Û bi vî rengî navê Qedem Xêr Qenî li ser lûtkeya çiyan wek awazeke bêdawîtiyê belav dibe, dibe rengê wêrektiyê li esimanê Loristan ê.

### Bidawî hatina serdemekê

Riza Şah ku di şerê çend salan de nekarî li dijî berxwedena di pêşengtiya Qedem Xêr ê de bi ser bikeve, hewl dide bi rêya dek û dolaban şervanên têkoşer vexwîne hevdîtinên ji bo aştî yê. Ji bo vê jî dest bi qomployeke berfireh dike, nameyek ji bo aşitî pêk were, tevî Quran a pîroz ku hatiye îmze kirin, ji şervanan re birê dike. Riza Xan piştî vexwandina şervanan, berovajî baweriya şervanan dest bi lîstokên qirêj dike û bi qomployekê hemû pêşengên têkoşînê dikşîne kemîna xwe. Di heman şeva hevdîtinan de 17 ji fermandarên eşîrê gule baran dike. Qedem Xêr jine qehremana Loristanê jî dîl dikeve dest û dixin girtîgeh ê. Bi vî rengî dawî li serhildanê tînîn.

Di derbarê pêvajoya li zîndan mayîn, nexweşî û mirina Qedem Xêr de gelek têştên cûda cûda tên gotin. Ligor hin çavkaniyan tê gotin ku Qedem Xêr piştî sê sal li zîndanê dimîne, nexweş dikeve û jiyana xwe ji dest dide. Ligor hin metnên nivîskî jî Qedem Xêr heya pîr dibe, di girtîgeha Tehranê de dimîne û li wir jiyana xwe jidest dide. Di metneke bi zimanê Farsî de jî tê gotin ku hêzên dewletê bi rêya sîxurên xwe jehrê dixin ser xwarina Qedem Xêr û bi vî rengî wê jehrxwarî dikin. Û cenazeyê Qedem Xêr dibin Iraq ê, nêzî şehîdên kerbelayê bin ax dikin. Her wiha ligor çîrokeke din jî tê gotin ku li bajarê Iranê Şuş an jî bajarê Dezfûl ku yek ji bajarên eyaleta Xuzistanê ye, tê veşartin.

Ev dawiya jiyana jineke têkoşîner, kesayetek wêrek û bêwest bû ku li hemberê zilma Şah rawestiya, qebîleya xwe parast, pêşî li koçberiya eşîra xwe girt û nehîşt êla wê li çar hêlan belav bibe.

# Pêwîstiya Yekîtiya Neteweyî

**Botan Amed**

Dîrok pirsên dijwar ji hin gelan re derdixe holê. Ev pirs ne tenê li ser rabirdûyê ne û ne jî tenê li ser pêşerojê ne… Bi rastî, her yek ji wan pirsek e ku li ser milên niha giran e, bersivên wê nayên paşxistin. Gelê Kurd yek ji wan gelan e ku bi van pirsan re rû bi rû ye. Erdnîgariyeke parçebûyî, avahiyên siyasî yên dabeşkirî, û îradeyên ku di aliyên cuda de belav bûne… Ev hemû her roj rastiyekê tîne bîra me: Hebûna bê yekîtî şêweyê herî nazik ê hebûnê ye. Yekîtiya neteweyî ne tenê armancek siyasî ye; ew di heman demê de pêdiviyek civakî, pêdiviyek çandî û berpirsiyariyek dîrokî ye. Ziman, bîr û pêşeroja gel heya wê astê hêz digirin ku ew dikarin li dora hişmendiyek hevpar werin cem hev. Wekî din, dema ku her beş hewl dide ku di hundurê xwe de li ber xwe bide, tevahî nikare were parastin. Yek ji pirsgirêkên herî bingehîn ên ku îro civaka Kurd pê re rû bi rû ye ev e ku cûdahî êdî çavkaniya dewlemendiyê nînin û bûne hincetek ji bo dabeşbûnê. Lê dîrok bêhejmar mînakan pêşkêş dike ku çawa cûdahî, dema ku bi hev re werin cem hev, dikarin hêzek mezin biafirînin. Tevgerîna bi hişmendiya parvekirina heman çarenûsê, ji axaftina heman zimanî wêdetir, bingeha yekîtiya neteweyî pêk tîne. Yekîtiya neteweyî nayê wateya yekrengiyê. Berevajî vê, ev tê wateya hevjiyana hevaheng a gelek dengan. Yekîtiyeke rastîn tenê dikare were bidestxistin dema ku nerînên siyasî, nêzîkatiyên îdeolojîk û dînamîkên civakî yên cûda di bin yek banî de werin cem hev. Ji ber vê yekê, yekîtî ne ew e ku aliyek ji ya din serdest be; ew îradeya hevdîtina li ser zemînek hevpar e. Ji ber vê yekê ev yekîtî çawa dikare were avakirin? Pêşî, divê kanalên diyalogê vekirî bimînin. Yekîtiyeke mayînde di navbera avahiyên ku guh nadin hev û hewl nadin ku hevdu fêm bikin de nayê avakirin. Nebaweriya hevbeş yek ji astengiyên herî mezin e, û ev astengî tenê bi zelalî û samîmiyetê dikare were derbaskirin. Ya duyemîn, nirxên hevpar hewce ne ku ji nû ve werin pênasekirin. Ziman, çand, dîrok û bîra civakî di nav van nirxên hevpar ên herî girîng de ne. Yekîtiyeke ku li ser van nirxan hatiye avakirin dê saxlemtir û mayîndetir be. Ya sêyemîn, pêdivî ye ku berjewendiyên demkurt derbas bibin. Dema ku hesabên siyasî yên rojane ji armancên civakî yên demdirêj girîngtir bin, fikra yekîtîyê qels dibe. Lêbelê, yekîtiya neteweyî sebir û ramana stratejîk hewce dike. Di dawiyê de, divê civak bi xwe di vê pêvajoyê de beşdar bibe. Yekîtî ne tenê di navbera rêberan de tê avakirin; ew bêyî piştgirî û beşdariya gel nikare were domandin. Ji ber vê yekê, her takekesek berpirsiyar e ku vê hişmendiyê li cihê xwe çêbike. Yekîtiya neteweyî ne tiştek e ku rojekê ji nişka ve çêbibe. Ew pêvajoyek e ku gav bi gav tê avakirin, hewcedarî bi hewldanê heye û bi demê re kok digire. Her beşdariyek piçûk a di vê pêvajoyê de tê kirin bingeha avahiyek civakî ya bihêztir di pêşerojê de datîne. Çiya dê her tim li wir bin. Lê pêşeroja ku mirovên ku li binê wan çiyayan dijîn dê ava bikin di destên wan de ye. Heta ku neyê jibîrkirin ku neyekbûn ne çarenûs e, û yekîtî mimkun e, her tişt dikare ji nû ve dest pê bike.



# Almaz Rûmî: Ji Şoreşa Rojava heta Rêveberiya Şaredariya Kobanê

**Rêveberiya Şaredariya Kobanê Almaz Rûmî eşkere kir ku tayînkirina wê gaveke ji bo zêdekirina rola jinan di saziyan de, tevî zehmetiyan û nebûna nûneratiya têrker, wê ji bo baştirkirina xizmetguzariyan li Kobanê û parastina taybetmendiyan berdewam bikin.**

**Hêvî Keleş/ Kobanê**

Bi guhertinên siyasî û îdarî ku li Sûriyeyê, çêbûn tevgera û rêxistinên jin jî beşdarî ji nû ve avakirina saziyan û xurtkirina rola jinan dibin, di nav wan de Almaz Rûmî ku di sazî û karê giştî de, gelek berpirsiyarî girtiye ser xwe da ku xizmeta civaka xwe bike û bi pirsgirêkên heyî yên xizmetguzarî û siyasî yên li herêma Kobanê re rû bi rû bimîne. Bicîhanîna peymana 29'ê Çile ya di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê de berdewam dike. Armanca vê peymanê ew e ku saziyên sivîl û leşkerî yên QSD'ê di nav yên Hikûmeta Sûriyê de entegre bike. Di 9'ê Nîsanê de, bi razîbûn û piştgiriya xelkê Kobanê, Almaz Rûmî wekî Rêveberiya şaredariya Kobaniyê hate tayînkirin, ku ev gaveke girîng di pêvajoya entegrasyonê de ye, ji ber ku ew yekem jin e ku di vê astê de cihek fermî digire. Almaz Rûmî wekî yek ji pêşengên Şoreşa Rojava derdikeve pêş, ji perwerdeyê bigire heya xebata saziyî, gihîştiye serokatiya şaredariya Kobanê, ew bi vê rola jinan di biryardanê de piştrast kiriye.



### Almaz Rûmî kî ye?

Almaz Rûmî wek jineke Kurd, ji destpêka şoreşa Rojava heta niha di nav kar û xebatên de cîh girtiye. Ew di sala 1989"an de li gundê Helencê yê li gundewarê Kobaniyê ji dayik bûye, berî ku xwendina xwe li Enstîtuya Sporê ya li Helebê bidomîne, li wir xwendina xwe ya bingehîn wergirtiye. Navê wê bi destpêka Şoreşa Rojava re wekî yek ji pêşengên avakirin û avakirina saziyên rêveberiya xweser derket holê, piştî wê dest bi kariyerek xebatê kir ku zêdetirî 14 salan dom kir, di nav de di navbera gelek Karan de geriya, destpêkê bi Yekîtiya Mamosteyan, dû re Desteya Ciwanan û Werzîşê û dû re jî Desteya Jinan. Her wiha di hevrêzkirina Kongreya Star û Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) de rolek lîst. Ji karê wê di warê jîngehê de wekî hevseroka Desteya Jîngehê, bigire heta tayînkirina wê wekî rêveberiya şaredariya Kobanê, bi vî awayî bû yekem jina ku di qonaxa entegrasyonê de di nav saziyên bajêr de xwedî cihek fermî bû. Girêdayî vê mijarê Rêvberiya Şarederiya bajarê Kobanê Almaz Rûmî ji Rojnameya me re axivî.

### 'Têkoşîna jinan tevî zehmetiyan jî berdewam dike'

Rêveberiya Şarederiya Kobanê Almaz Rûmî tayînkirina xwe wekî gaveke erênî ber bi beşdariya jinan ve dît û got: "Ev gav di çarçoveya qebûlkirina jinan di nav saziyên hikûmetê de erênî ye, nemaze ji ber ku ev sazî berê bi hişkbûna xwe ya li hember pirsgirêkên jinan dihatin nasîn. Namzedkirina min û qebûlkirina min ji aliyê wan ve wekî surprîzek hat, lê di heman demê de ew guhertinek nîşan dide ku dikare li ser were avakirin. Têkoşîna jinan tevî zehmetiyan jî berdewam dike, em ê bi berdewamî bixebitin da ku jinan ji astengiyên civakî rizgar bikin û bikaribin rola xwe ya pêşeng bilîzin. Berpirsiyarî îro mezintir e, lê em ji şiyana jinan a îspatkirina hebûna xwe li cîhên kar ên cûrbecûr bawer in. Derbarê beşdarbûna min di civînên ku li Parêzgeha Helebê ji bo nîqaşkirina cîbicîkirina bendên peymanê hatine lidarxistin de. Di civînan de temsîliyeta jinan tune bû, ji ber ku di şandeya ji Kobaniyê de tenê du jin hebûn. Me di salên borî de li ser bilindkirina pirsgirêkên jinan û balkişandina ser rola wan û pêwîstiya ku ew di nav saziyan de bibin şirîkên biryardanê, xebitîn."

### 'Em hewil didin ku xizmetekê baş ji xelkê kobanê re bikin'

Almaz Rûmî derbarê rewşa xizmetguzariya bajêr de, got ku Kobanê zehmetiyan dikişîne: "Bajar di dîrokê de ji bêparbûnê êş kişandiye û di salên şer de ji ber êrîşan rastî wêraniyeke mezin hatiye, ku rasterast bandor li binesaziya wê kiriye. Tevî hewldanên berê jî, ew hîn jî ji bo baştirkirina rewşa xizmetguzariya xwe piştgiriyeke rastîn hewce dike. Em hewl didin ku xizmetekê baş ji xelkê Kobanê re peyda bikin û asta xizmetan baştir bikin. Ev yek hewldanên hevkariyê û piştgiriyek berdewam hewce dike. Kobanê ji ber berxwedana xwe ne tenê li herêmê, lê di heman demê de li seranserê cîhanê jî xwedî girîngiyeke sembolîk a taybet e. Me ev wêne û pêdiviyên wê yên xizmetguzariyê anîn ziman bi hikûmetê û wan jî hevkariya xwe di vê çarçoveyê de nîşan dan. wan xwestin ku navê bajêr biguherînin, lê me pabendbûna xwe bi navê Kobanê re, ji ber girîngiya wê ya sembolîk a mezin, bi taybetî piştî berxwedana wê ya li dijî DAIŞ'ê, piştrast kir. Niştecih jî guhertina navê Kobanê red dikin û ev yek ew tişt e ku me di nîqaşan de tekez kir û em ê berdewam pê ve girêdayî bin."

### 'En bang li gel dikin ku piştgiriya vê qonaxê bikin'

Di dawiyê de, Rêvberiya Şaredariya Kobanê Almaz Rûmî li ser helwesta niştecihan a derbarê pêvajoya entegrasyonê de axivî: "Em fêm dikin ku hin kes fikarên xwe hene, lê em bawer dikin ku ev gav ji bo parastina destkeftiyên qonaxa berê, organîzekirina xebata saziyî û parastina karakterê bêhempa yê herêmên me pêwîst bû. Ji ber vê yekê, em soz didin gelê xwe ku em ê li gorî vê berpirsiyariyê tevbigerin û em bang li wan dikin ku piştgiriyê bidin vê qonaxê."

# Bazarên dîrokî yên Sûriyê di xeteriyê de ne

**Navenda Nûçeyan**

**Wezareta Weqfên Olî ya hikumeta demkî ji Weqfa Diyanetê ya Tirkiyeyê qeydên weqfên Osmanî yên Şam, Heleb û Hemayê xwestin. Bazirgan û xwediyên dikanan ditirsin ku milkên wan ji destê wan bigirin.**

Axaftina rayedarekî Wezareta Weqfên Olî ya hikumeta demkî ya Sûriyê bû rojeva bazirgan û xwediyên dikanan û hate rexnekirin. Rayedar gotibû Wezareta Weqfên Olî ya hikumeta demkî ji serokê Weqfa Diyanetê ya Tirkiyê qeydên weqfên Osmaniyan ên Şamê, Heleb û Hemayê xwestine. Çavdêran ev yek nirxand û dipirsin çima Wezareta Weqfên Olî ya hikumetê qeydên weqfên Osmanî dixwazê?

Li gorî agahiyên li ser çapemeniya herêmî ya Sûriyê belav bûn, wezaretê gotiye wan qeyd xwestine, ji bo mafên weqfeyê tesbît bikin û qeydan ji nû ve bi rêxistin bikin.

Wezareta Weqfê diyar kir ku li Şamê bi hezaran milk li ser navê wan hatine qeydkirin. Mînak nîvê bazara El Himêdiyê û bazarên kevn ên Şamê wekî Midhet Paşa, Bizoriyê, Menaxliyê, Bab Serîce, Heleb, Hema, Himis û Laziqiyê bi navê wan hatine qeydkirin. Çavkaniyekî nêzî wezaretê got wezareta hikumetê dixwaze bi rêya qeydên weqfên Osmaniyan destê xwe deyne ser van milkan. Ev yek bûye sedem ku bazirgan û xwediyên dikanan bitirsin ku waqif dest deynê ser milkên wan. Çalakvan, pispor, bazirgan û xwediyên dikanan anîn ziman ku xwediyên dikanan neçarin an kirê bidin an jî dikanan vala bikin. Dibe ku ev dikan û mik ji berê de kirîbin an jî ev bûye bi salan li ser navê wan hatiye qeyd kirin.

Rexnegiran diyar kirin ku ev gav dê bibe sedema li bazarên dîrokî û bi taybet bazarên Şamê, gelek guhertinên aborî çêbibin. Êdî dikandarên ku bi salan ew xwediyê dikanên xwe ne, dê neçar bimînin ku kirya dikanan bidin, Wezareta Weqfê.

### 'Arşîv li Sûriyê heye, çima qeydên Osmanî dixwazin?'

Pisporekî ji Navenda Belgekirina Dîrokî ya girêdayî Rêveberiya Giştî ya Şûnwar û Muzexaneyan a Şamê ku nexwest navê wî were naskirin, wiha got: "Navenda me sala 1959`an hatiye vekirin. Navenda me ji gelek beşan pêktê. Yek ji beşan jî beşê Osmanî ye. Di beşê Osmanî de belgeyên herî kevnar ên Sûriyê hene. Çavkaniyên dîroka civakî û aborî yên Sûriyê ne.



Li Navendê qeydên dadgeha zagonsaz ku 2900 qeydên Şamê, Heleb, Hema, Humis û Laziqiyê ne, hene. Berê Navenda me ji aliyê kesên ne diyar ve, hat şewtandin, hem jî dizîn û talan kirin. Sûriyê dewleteke bê arşîv e. Sala 2006`an komîteyek hat avakirin ji bo qanûnên arşîvê amade bikin. Ev dosya gelekî girîng e, lê belê heyanî niha jî komîteya amadekirina qanûnên arşîvê ji aliyê Meclisa Gel ve nehatiye erekirin."

Heman pisporî got: "Qeydên erd û mik li Dezgeha qeydkirina milkan e, qeyda nifûs, bav û kalan û malbatê jî yên ji dema Osmaniyan `sedsala 19`emîn li navenda Nifûsan e. Piştî ku Wezareta Weqfan destûr da ku Weqfa Diyanetê ya Tirkiyê semîner û dewreyên perwerde ji hinek kesên nêzî hikumetê û karkerên di dosya erdan ên girêdayî hikumetê ne, birêxistin kirin, êdî ev mijara li qeydên weqfên Osmanî vegerin, xistin rojevê de. Ji ber vê yekê dibe ku derî li ber sextekariyeke mezin were vekirin. Ji ber vê yekê divê qeydên dîrokî werin parastin. Eger belgeyên kevn têkevin destê Wezareta Weqfan dibe ku bişewtînin û ji holê rakin."

### Helwesta bazirganên Elhimêdiyê?

Yek ji bazirganên herî kevn ên bazara El Himêdiyê ya Şamê Ebo Omer wiha got: "Bavê min dikan kirîbû û milkê me ye, bi navê min hatiye qeydkirin. Ez di hemû şert û mercan de ji dikana xwe dernakevim. Axaftinên li ser bazarên kevn têne kirin teşeyekî nû yê dagirkirinê ye û ev yek ji bo berjewendiyên Tirkiyê tê kirin û dixwazin Osmanî dîsa vegerin Sûriyê. Bazirganên Şamê xwediyê nav û dengekî dîrokî ne. Wezareta Weqfê bi nezanî ev rojev vekir. Gelek dikanên bi navê Weqfê hene lê belê nadin xebtandin. Em ji Wezaretê dixwazin bi edalet vê pirsgirêkê çareser bike û bi me re destbi şer nekin. Li Şamê 55 bazarên kevn hene û Osmaniyên nû dixwazin Şamê dagir bikin."

### 'Dê pirsgirêkên qanûnî û aborî derkevin'

Hesan El Ebid jî wiha axivî: "Eger qeydên mal û mikên Sûriyê li dezgehên qeydkirinê û navendên belgekirinê hene çima dê li belgeyên qeydkirina Osmanî vegerin? Eger dosya belgeyên qeydkirina Osmanî vekin dê gelek pirsgirêkên qanûnî û aborî derbikevin. Bi taybet bazarên kevn û dîrokî ev bûye bi salan ku milkê xwediyên xwe ne û nabe ku ji destê wan derxin."

Li gorî çavdêran ji ber qanûnê arşîvê yên fermî nînin, gelek metirsî hene ku bi belgeyan bileyîzin. Rexneger jî dibêjin eger Wezareta Weqfê vegerê qeydên Osmanî ev yek dê bibe sedema ku Tirkiyê destwerdana Sûriyê bike.

Sûriyê sala 1516'an di şerê Merc Dabiq de heyanî sala 1918`an ji aliyê Osmaniyan ve hate dagirkirin.

**ANHA**

# Meşa 19'ê Nîsanê: Bilindkirina dengê jinan bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo

Aktîvîsta Tevgera Jinên Azad (TJA) Hawa Can û hevseroka Dem Partiyê ya Batmanê Songül Demir diyar kirin ku armanca meşa 19'ê Nîsanê ya ku wê li Gemlîk a Bakurê Kurdistanê bê lidarxistin, azadiya Rêber Apo ye, ji ber bêyî Rêber Apo pêvajo nayê meşandin û gotin, "Erka jinan ji bo azadiya Rêber Apo, çalakiyên demokratîk in ku hemû kes xwe di nav de bibîne, ji ber azadiya jinan, bi azadiya Rêber Apo ve girêdayî ye."

**Ronaz Silêman**

Rêber Apo ji sala 1999'an ve bi komployeke navneteweyî hate girtin û radestî dewleta Tirk hate kirin. Ev 27 salin Rêber Apo di bin şert û mercên giran ên tecrîdê li Girava Îmraliyê, dijî. Li hemberî her zor û zehmetiyekê Rêbertî tawîz neda û berxwedaniyê dike. Herwiha li gorî qanûnên dewleta Tirk ku wê jî weke gelek dewletên din mafê hêviyê erê kiriye, lê ew bi xwe jî vê qanûnê bi cih nayîne, ji ber divyabû niha Rêber Apo bi fîzîkî azadkirî ba, lê ji ber nepêkanîna qanûnan, heya niha ev maf ji bo wî nehatiye dayîn. Lê ji ber Rêber Apo temsîla gelê bindest, bi taybetî ya jinan dike, her kes daxwaza azadiya wî ya fîzîkî dikin, di vê çarçoveyê de jî bi kampaniya û çalakiyên cur be cur radibin. Bi taybet piştî destpêkirina pêvajoya Aştiyê ku ji aliyê Rêber Apo ve di 27'ê Sibata 2025'an hatiye destpêkirin, banga azadiyê hîn bilindtir bûye. Di heman demê de her kes tekez dike ku beyî azadiya Rêber Apo, aştiya rastîn misoger nabe. Li gor şert û mercên ku tê xwastin û ji bo rêveçûna pêvajoyê pêwisti bi azadiya fîzikî ya Rêber Apo heye.

**Meşa 19'ê Nîsanê**

Tevgera jinên Azad (TJA) ji bo pêkanîna azadiya fiziki ya Rêber Apo di 19'ê Nîsanê de, di bin dirûşmeya "Dem dema azadiyê ya jinan û azadiya Rêber Apo ye" li Gemlîk a Bursayê ya Bakurê Kurdistanê, meşeke tê lidarxistin. Dê jin ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji gelek bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê berê xwe bidin Gemlîkê û li wir bi meşê dengê xwe derxînin. Destpêkê wê 2 otobis ji Amedê rêkevin ber bi Colemergê, wê li wir bên pêşwazîkirin, piştre bi giştî jî ber bi Gemlîkê ve rêkevin. Herwiha li Gemlîkê wê jin xwe bighînin hev. Ev çalakî weke meş e, daxuyanî jî were dayîn.

Derbarê meşa ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ku di 19'ê Nîsanê de li Bakurê Kurdistanê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad (TJA) bê lidarxistin, Aktîvîsta TJA'yê Hawa Can û hevseroka Dem Partiyê ya Batmanê Songül Demir ji Rojnameya me re axivîn.

**'Beyî azadiya Rêber Apo wê di pêvajoyê de xetmandin bê jiyankirin'**

Hawa Can armanca meşa ku di 19'ê mehê de bê lidarixstin diyar kir ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye û wiha got: "Armanca meşa me ya ku em li dar dixin, ji bo azadiya Rêber Apo ye. Hedef û armanca Tevgera Jinên Azad TJA jî, ev e ku bêyî Rêber Apo pêvajo nayê meşandin, herwiha xetmandinê dide jiyankirin. Ji bo vê sedemê hewce ye ku di demeke nêz de, mafê jiyanê bê dayîn."

**'Armanca Rêber Apo ew e ku hemû pêkhate bi hev re di nav aramiyê de bijîn'**



Hawa Can



Songül Demir

Hawa Can di berdewamiya axaftina xwe de cudahiya meşa 19'ê Nîsanê ji meşên beriya wê anî ziman û wiha bilêv kir: "Cudahiya wan meşan û meşa 19'ê mehê ew e ku ne tenê ji bo azadiya Rêber Apo ye. Lê di kesayeta Rêber Apo de, azadiya hemû mirovahiyê pêk tê. Ji ber ku Rêberê Gelê Kurd Rêber Apo, armanc û daxwazên wî ev in ku li Rojhilata Navîn hemû pêkhateye bikarin bi hev re di nav aramiyê de bijîn."

**'Dayik weke her demş pêşeng e'**

Hawa Can eşkere kir ku jinên Kurd şopdarên rêya azadiyê ne û li pey heqîqatê dimeşin û wiha domand: "Beşdarvanên meşê hemû jin in. Dayik jî wek her dem dîsa pêşeng e. Peyama me zelale, jinên Kurd şopdarên rêya azadîxwaziyê ne û li pey heqîqatê dimeşin. Herwiha Rêber Apo jî îradeya me ya jinên Kurd e. Heman demê de Erka jinan ji bo azadiya Rêber Apo, çalakiyên demokratîk in ku hemû kes xwe di nav de bibîne û pêşengtiyê ji hemû qadan re bikin. Ji ber ku azadiya me ya jinan, bi azadiya Rêber Apo ve girêdayî ye."

**'27 sal astengî û tecrîda giran'**

Hawa Can axaftina xwe wiha qedand: "27 sal in Rêber Apo di girtîgeha Îmralî de ye û li gel hemû astengî û tecrîda giran de tê ragirtin. Di bin van şertan de, ne pêkan e ku Rêber Apo bi her kesî re hevdîtin bike û pêvajoyê bi awayekî tendurist bimeşîne. Ji bo birêvebirina vê pêvajoyê û ji bo mafê hiqûqî yê jiyanê, divê ev maf were dayîn, ev heq dereng jî maye. Ji ber van hemû mijaran, wek jinan em ê berê xwe bidin giravê, da ku hemû kes bizanibin azadiya Rêber Apo, azadiya hemû gelan e."

**'Azadiya Rêber Apo ji bo jinan taybetî pir girîng e'**

Songül Demir diyar kir ku ew azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dixwazin û wiha got: "Armanca me ji bo Rêberê me ye ku em azadiya wî ya fîzîkî dixwazin. Ji ber ku heta rêberê me azad nebe, em jî tu carî azad nabin. Rêber Apo gavên ji bo aştiyê avêtine, lê em qebûl nakin ku dewlet neavêje, divê ew jî gavê biavêje û her tişt bi zelalî çêbibe. Azadiya Rêber Apo girîng e, ji ber heq û mafê Rêber Apo daye me, tu kesî din nedaye me. Lewra divê em jî li pey Rêberê xwe bin. Herwiha sedema ku em ewqas girîngiyê didin Rêber Apo ew e ku wî rûmetekî mezin daye jinan, bi taybet jinên Kurd ên dilêşyayî."

**'Rêberê me hêjayî ye ku em şev roj bo wî li kolanan bin'**

Songül Demir axaftina xwe wiha bidawî kir: "Rêberê me Rêber Apo hêjayî ye ku em şev û roj ji bo wî li kolanan, di meşan û çalakiyan de beşdar bibin. Herwiha, divê em zextê li dewletê bikin, da ku ji bo Rêber Apo gavekê biavêje. Ji ber ku aştî di destê Rêber Apo de ye û ji aliyê wî ve dê aştî pêk were."




FENER



Idrîs Henan

## Bi Şêwazên Nerm Kiritîna Axa Sûriyê Dewam Dike

Mîsaka Millî ango; Peymana Neteweyî nexşeyeke rewakirina dagirkeriyên Tirkiyê yê pêşerojê ye. Oparasyonên siyasî û leşkerî li ser Sûriyê û Îraqê jî, ji ber fêmkirina teorî ya vê peymanê ne. Ji lew re; herêmên weke Kerkûk, Mûsil, Heleb û îroj Şam û tevayî Sûriyê rûbirûyî vê hişmendiya ku rêzê ji sînorên razber û şênber ên gelan re nagire ne. Ango; Heya cihê kevirê xwe digîne, sînorên wê ne!

Li ser vê bingeha têgihaştinê, îroj siyaseta Tirkiyê ya nûjen, piştî hilweşîna rejîma Esad li Sûriyê, şerê li dijî Îranê, avabûna blokên hêzê û serweriyê li herêmê û cîhanê, derbasî qonaxek nû dibe.

Di serê sedsala 20`an de, ev qonaxa nû rastî gelek nîqaşan hatiye û di dawiya serdema dewleta Osmanî de weke venêrandinek pêşerojê ji netew dewleta Tirkiyêya sibê re hatibû vesazkirin. Ji ber vê sedemê, çi êriş û dagirkeriyên ku îro Tirkiyê li herêmê dimeşîne, bi van hîncet û gotegotan rewa dike.

Di serdema desthilatdariya Baas de, têkîliyên Tirkiyê û Sûriyê rastî gelek rewşên kirîtîk hatin. Di encamê de bi Peymana Edenê re hate tacîdarkirin ku rejîma Baas rê da Tirkiyê ta 5 KM, di bin navê ewlehiyê de, axa Sûriyê bin pê bike. Lê heya berî serdema Buhara Gelan, destwerdanên Tirkiyê li Sûriyê, li gorî hinek itîbarên herêmî û navdewletî sînordar bûn. Lê çawa qonaxa Buhara Gelan dest pê dike, hebûna leşkerî ya Tirkiyê li Sûriyê û Îraqê zêde dibe. Li her derê êrişan pêk tîne û piştgiriya komên çete yên weke DAIŞ, El-Nusra û Artêşa Neteweyî ya bi navê Ceyiş Elhur dike. Êrişa li ser Kurdan û projeya demokratîk li Sûriyê armnacek wê yê sereke bû ku weke astengiyekê bingehîn ji bo bicihanîna Mîsaka Millî lê dinêre.

Piştî guherîna desthilatdariya li Sûriyê û bi hatine HTŞ û pêşketinên siyasî, aborî û otorîteyî re, hebûn û serweriya Tirkiyê li herêmê xurt dibe. Bi projeyên xizmetguzarî, perwerdeyî, hevkariya îdarî û sernavên veberhênanê, dest bi plana guherîna demografîk kir û hebûna xwe ya bi sazî tekûztir kir. Îro jî pisporên stratejîk ên siyaseta Tirkiyê dibêjin ku; Tirkiyê veguherînekê jiyan dike û ji amûrên hişk ên hêzê (leşkerî), ber bi amûrên hêza nerm ve diçe.

Di çarçoveya hemleyên dagirkeriya bi amûrên hêza nerm de, îroj li Sûriyê mal û milkên xelkê li gorî Taboyên (belgeyên) serdema Osmanî tên vesazkirin. Dozên aborî, pirsgirêkên malkaniyên taybet û derewên ji nû ve avakirinê, bûne sloganên spandina destserkirina mîrateya gelên Sûriyê. Ev jî cihê berteka gelên Sûriyê ye ku desthilatdariya HTŞ weke Tabûra Pêncemîn, xizmetî berjewendiya Tirkyê ya Neo-Osmanî dike, dibîne. Ango; hikûmeta HTŞ bi berovajîkirina têgehên dîrokî re, li ser rol û niyeta Tirkiyê li herêmê dinixumîne û destek dide peymana Mîsaka Millî û li ser hesabê keda gelên Sûriyê, divejîne.

Desteserkirina saziyên dewletê yên pîşesazî, tekstîl, tendirustî, Telekomunîkasyon, enerjî, dadmendî û rawestandina derhatiyên berhemên welat, bandorek neyînî li jiyana gel kiriye û kirîzek jiyînê ya di bin navê (nan û qanûnê) de çêkiriye. Di heman demê de seynala şêwazeke nû ya berfirehkirina dagirkirinê ye.

Bi gotinek din; li şûna ku bi rêbaza hişk a ji hundir ber bi derveyî sûnor ve were, îcar bi rêbaza nerm ji derveyî sînor kiritîna ber bi hundir ve ye. Ev yek jî bi hevkarî û desteka desthilatdariya heyî re tê rewakirin.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**

Helbestvan Anahîta Sîno ; Sembola jina Kurd a azad û xweragir

Tevî ku nivîskar û helbestvanên jin ên Kurd bi dijberiyên civakî, siyasî û çandî re rûberû bûn, lê karîn navên xwe di bîrdanka wêjeya Kurdî de bikolin û bi kûrahî beşdarî parastina ziman û nasname û dewlemend kirina çanda neteweyî bibin, bi helbestên ku derbirîna pirsgirêkên jinê, welat û azadî dikin.

Nivîsarên wan ne tenê qîrînên derbasbûyî bûn, lê serpêhatiyên mirovahî yên bi hişmendiyê zindî bû ku dilê mirov digirin xem û hêviyên wî ji bo azadiyê digirin dest û bi wêrekî daxwaza şikandina qeyd û bendên ku hatine ferzkirin li ser jin û civakê dikirin , gelek ji wan hevrêzî dikirin di navbera peyv û helwestê û di navbera wêje û têkoşînê de, wan nivîsarên xwe kirin neynikek ji bo jina Kurd û dengê azadiyê.

Di vê çerçovê de, helbestvana Kurd Anahîta Sîno wek dengek cûda xwe nîşan dide, ku dîmena çanda Kurdî dewlemend kir bi têkilhevkirina wê di navbera azmûna kesayetî û nasnameya neteweyî de, helbestên wê bûn berdewamîya bîra gel û bangek helbestî ye ku ziman û nasname ji heladin û bîrbirînê diparêze.

Helbestvan û nivîskara Kurd Anahîta Sîno di 21'ê Sibata 1972'an de, li bajarê Serêkaniyê a li Rojavayê Kurdistanê, ji dê û bavek Kurd (Sîno û Sultanê) hatiye dinyayê, ew di nav malbatek Kurdperwer , welatparêz û evîndarê azadiyê mezin bûye ku ji pênc zarokan (çar keç û Kurdekî ) pêk tê .

Kariyera wê ya wêjeyî di temenek piçûk de dest pê kir, di sala 1988'an de, dema ku li dibistana amadehiyê dixwend, dest bi nivîsandina helbestan kir, di despêkê bi zimanê Erebî , dest bi nivîsandina bîranînên xwe kir , lê paşê guherî ber bi nivîsandina zimanê Kurdî, wekî beramberîyek li dijî bendên ku hêzên hêkûmetê Sûriyê li ser bikaranîna ziman û çanda Kurdî ferzkirîn, evê rewşê ew neçar kir ku bi hevalên xwe re komek veşartî ava bike da ku di nav malan de bi zimanê Kurdî fêr bibin. bi vê şêwazê wê serîhilda li dijî siyasetên zordestiyê yên ku armanca wan jêbirina nasnameya Kurdî û pijavtina zimanê Kurdî bû.

Nivîsarên xwe di gelek kovarên wêjeyî û çandî de weşand, wek: (Mewasim – Zevî – Zanîn – Sorgul – Rojda – Zengel – Babîsok û hwd), di bin navên nediyar de, ku pişt wê nasnameya xwe ya rastî diveşart ji ber tirsa şopandina ewlehiyê û astengiyên siyasî. Anahîta bi dijberiyên giran re rûberû bû, bi taybetî ji ber ku nasnameya Sûriyê ji wê hatibû girtin, ev yek bû astengiyek mezin ji bo berdewamkirina perwerdehiya wê ya zanîngehê. Tevî siyaseta zordest û xumûtkir a hêzên desthilatdar a Sûriyê di ser Kurdan di wê demê pêk dianî, Anahîta bi zimanê dayikê xwe ve girêdayî ma, wê xwe fêrî zimanê Kurdî kir û bi wî zimanî gelek helbest, gotar û çîrok nivîsandin.

Di wê demê de, Anahîta bi komek heval û hogirên xwe re wek: ( Dîlan Şewqî, Teymûr Efdekî, Mizgîn Tahir, Hesan Ayû, Ebdulwehhab Pîranî û yên din ) beşdarî damezrandina komeleyek wêjeyî ku navê wê Ronak bû. Paşê navê wê hate guhertin û bû Rewange.

Ev komele ji hêla çandî û wêjeyî ve çalak bû û di sala 1992'an de kovarekî edebî ya bi zimanê Kurdî bi navê Babîsok weşand.

Lê mixabin, tenê sê hejmar jê hatin weşandin, paşê çalakiyên komeleyê rawestiyan û dergehên wê jî ji bo xwendekaran hatin girtin.

Helbestvana Kurd Anahîta di sala 2000'an de zewicî û ew niha dayîka çar zaroka ye (sê keç û kurek), piştî ku ji bajarê xwe Serêkaniyê koçber bû, ew bi hevjîn û zarokên xwe re li bajarê Qamişlo rûniştine. Li wir jiyana xwe di nav germahiya dayîtiyê û ronahiya gotinê de didomîne.

Helbestvana Kurd Anahîta helbestên xwe bi şêwazekî edebî û bedew, bi hemû cûreyên helbestê nivîsandiye ( helbesta klasîk a terazû , helbesta nûjen û azad û pexşan), wê gelek berhemên edebî bi zimanên Kurdî û Erebî weşandine, bi taybet li ser mijarên jin, evîn, azadî û nasnameya neteweyî.

Ji berhem û xebatên wê yên wêjeyî , çar pirtûkên wê hatine çapkirin: sê dîwanên helbestan û berhevokek ji çîrokan folklorî:

1. Dîwana helbestê bi zimanê Kurdî ( Hestên ji Damarên Xabûr) di 2002'an de hate weşandin, ku hest û serpêhatiyên wê yên kesane di bin zordestiya çandî de nîşan dide.
2. Dîwana helbestê bi zimanê Erebî ( Min nivîst ji ber ku ji te hezdim), di 2018'an hate weşandin , ku mijarên evîn, jin, û welat di nav de tên vegotin.
3. Dîwana helbestê bi zimanê Erebî ( Li ser bextê Zeyzefûnê), li ser şehîdan, şoreşgeran û hesreta welatê diaxive, di 2024an hate weşandin.
4. Berhevokek ji çîrokan folklorî bi zimanê Kurdî, di 2018'an de hate weşandin bi mebesta tomarkirin û parastina mîrasa gelêrî ya Kurdî.

Hunera wê ya wêjeyî û çandî bi nivîsandina helbest û çîrokan sînordar nema, lê di heman demê de wê gelek gotarên edebî, çandî û siyasî jî nivîsandin.

Nivîsarên wê zêde bandor girtin ji serpêhatiya koçberiya wê ya bi zorê ji bajarê wê Serêkaniyê, piştî êrîşên Tirkan û çeteyan li ser wan. Ev rêwîtiya koçberbûnê bû mijarek sereke di xebatên wê yên torevanî de, di nivîsên xwe de tekezî li ser rewşa jina Kurd kir, êşên wê, hêviyên wê û bêdeng kirna wê nîşan dike, vê yekê hişte ku Anahîta bibe yek ji sembolên wêjeya jina Kurd.

Wê di helbest û çîrokên xwe de, mijarên girêdayî bi nasnameya Kurdî, sirgûn, têkoşîn û bêparbûn îfade kirine, hişte ku naverokek siyasî û mirovahîyeke girîng nivîsên wê bistînin.

Di nav helbestên wê de mijarên nasname, azadî û jinê bi rûmet û ronahî xuyang dibin, dihêle ku ew bibe sembolek ji bo afirînerî û berxwedana çandî li herêmê.

Herwiha wê gelek reşnivîsên edebî hene li benda çapê ne, di nav wan de :

1. Berhevojek çîrokên li ser şehîdên Serêkaniyê
2. Dîwanek helbest bi zimanê Kurdî
3. Dîwanek helbest bi zimanê Erebî

Zêdetir ji vê jî, piştî dagirkeriya Serêkaniyê, wê li dû xwe reşnivîsên sê pirtûkan jî hiştin, ku yek ji wan pirtûkan derbarê rola jinê di şoreşa Rojava de bû.

Gelek helbestên klasîkî ên stranbêjiyê jî, li ser bingehê kêşe û rêzbend nivîsandine û bi xêzên evîn û bîrhatinê hûnandine, gelek hunermendên navdar ên Kurd, wekî (Mehmûd Ezîz Şakir, Ronîcan Heso, Mihemed Elî Şakir, Mehsûm Şikakî û hunermendên din,) awaz ji wan re çêkirine, û gelek hunermend û komên hunerî yên Kurd gotinên helbestên wê di albûmên xwe de strandine , ji wan yên navdar :


1. Efrîn – Mahmûd Êzîz Şakir
2. Lê Heyvê – Ûmîd Silêman
3. Gul Firoş – Ronîcan Heso
4. YPJ û Dayê _ Sumeya Mihemed
5. Kî dile te li min hişek kir – Xidir Silêman
6. Dînê Dilê Min – Muntesir Salih
7. Şoreşa Kezya – Koma Şehîd Sakîne
8. Di hundirê Şoreşê – Koma Şehîd Welat.

Anahîta Sîno di qada çand û hunerê de xebitîye, û karê rêveberiya Navenda Çand û Huner a Wêşokanî bi hemû şaxên wê yên hunerî û şanoyî zêdetir ji çar salan kiriye. Piştî vê, ew çûye nav karê Yekîtiya Rewşenbîran û ew bûye hevseroka Yekîtiya Rewşenbîran ya şaxê Serêkaniyê heta roja dagirkeriya wê ji alîyê dagirkerên Tirk û çeteyên wê ve.

Li vir trajediya mezin di jiyana wan de dest pê kir, dema ku ew bi darê zorê ji malên xwe derketin û li pey xwe her tişt hiştin, malên xwe , xaka xwe , bîranînên xwe, wêneyên xwe û her tiştên ku bi zarokatiyê û jiyana wan ve girêdayî, ev ê trajediyayê birînek kûr hêla ku di giyanê wê de qemûşk nagire.

Piştî dagirkeriya bajarê wê Serêkaniyê, ew veguhêziye bajêrê Qamişlo û bûye hevseroka Yekîtiya Rewşenbîrên kantona Cizîrê, wê xebat kir bo bilindkirina çanda Kurdî, bi taybetî di nav jinan de ,her weha, ew beşdar bû di damezrandina baxçeyên xwendekaran li Qamişlo û Hesekê, bi armanca teşwîqkirina xwendinê û rêveberiya çalakiyan û bûyerên çandî.

Herweha, ew beşdarî gelek şevbuhêrkên edebî û festîvalên çandî û wêjeyî bûye, wek festivala heştê ya çîroka Kurdî, ku li wir çîrokeyek bi navê "Şehîd Orhan" pêşkêş kir, tê de diyar kir qurbaniyên gelê Kurdî li hemberî terorê, ew beşdarî çar dewrên Festîvala wêje û Huner Jinê bûye, û di hemû çar dewran de wê xelatên rûmetê wergirtine. Di dewra şeşemîn de, xelata duyemîn û di dewrên hêftemîn û heştêmîn de, xelata yekemîn wergirte.



Di Nîsanê sala 2025 de, Anahîta beşdarî dewra dehêmîn a Festîvala Wêje û Hunera Jinê li Qamişlo bû, li wir xelata duyemîn ya helbestê bi zimanê Kurdî di gel helbestvan Sulava Ararat wergirt, wek rêzgirtinek ji bo afrîneriya wê ya wêjeyî.

Tevî koçberiya bi darê zorê bi serde qewimî piştî dagirkirina bajarê wê, Serê Kaniyê, ji hêla Tûrkiye ve, di sala 2019'an de, wê berdewam kir di nivîsandin û vegotina êşên gelê xwe de, û tekezî li ser giringiya zimanê Kurdî di veguhastina kelepûr û rastiya Kurdî de di kir.

Anahîta dibîne ku wêjeya jinan beşek bingehîn e ji tevna çanda Kurdî , her wiha bawer dike ku ew amûrek ji bo parastin û nûkirina mîrateya Kurdî ye, û wek rêgeyek ku jina Kurdî mafê xwe bidest bixe da ku bi azadî derbirîna hest û serpêhatiyên xwe bike, û dengê xwe ji wê bêdengîya serdestan azad bike.

Helbestvana Kurd Anahîta di wêjeya Kurdî ya hevdem de yek ji dengên jinan yên herî navdar tê nasîn û roleke girîng di dewlemendkirina wêje û çanda Kurdî de lehîstiye ,bi bilind kirina dengê jina Kurdî di rêya helbestên xwe re, ku di nav de mijarên jin, azadî, nasname û jiyana rojane tên ronîkirîn , wê wêneyek rast û hestyar ji serpêhatiyên jinên Kurd pêşkêş kir, vê yekê cihekî taybetî da wê di nav girsiya xwendekar û baldarên wêjeya jin a Kurdî de, di helbest û çîrokên xwe de , wê mijarên girêdayî nasnameya Kurdî şîrove kirine, Helbestvan û nivîskara Kurd Anahîta nişaneke zelal û bi bandor di qada çandî û edebî ya Kurdî de hişte ,bi riya karên xwe yên afirînerî û beşdariyên çandî yên cuda,

Anahîta Sîno ew nimûneyek e ji bo jina Kurd ya rewşenbîr û torevan ku bi pirsgirêkên gelê xwe pabend dimîne û serî hildide li hemberî astengiyên sîyasî û civakî da ku ziman û nasnameya çandî ya xwe biparêze, û cih û rûmeta jinê di civaka Kurdî de bilind bike, bi riya karên xwe yên edebî û beşdariyên xwe yên çandî , wê rolek girîng lehîst di dewlemendkirina wêjeya Kurdî , û bilindkirina statûya jinê di civakê de, vê yekê hişte ku ew bibe yek ji kesayetanê herî navdar di dîmena çandî ya Kurdî ya hevdem de.

Daxwaza min ji bo wê tenduristîyek domdar, serkeftin û afirîneriyek zêdetir.



Remezan Olçen

## Xwendina bi komî

Xwendin, ne tenê çalakiya têgihîştina peyv û ristan e; ew deriyê cîhanên nû, nasnameyên cuda û azadiya ramanê ye. Di dîroka mirovahiyê de tu şaristanî bêyî xwendin û nivîsandinê bi pêş neketiye. Ji bo takekesekî, xwendin xwarina herî bingehîn a hiş e. Lê dema ev xwendin ji sînorên kesane derdikeve û dibe çalakiyeke kolektîf, hingê bandora wê ya li ser civak û ziman dibe xwedî hêzeke veguhêz.

Xwendin, şiyana rexnekirin û analîzkirinê dide mirov. Kesê ku dixwîne, ne tenê agahiyan werdigire, di heman demê de hîn dibe ku pirsan bike. Di serdemeke ku agahiyên qirêj û propagandayên vala her der dorpêç kirine de, pirtûk dibin mertalê hişê me. Xwendin empatiyê pêş dixe; em bi xêra pirtûkan daxwaz, êş û şahiyên mirovên ku me qet nedîtine fam dikin. Ev yek jî bingeha civakeke demokratîk û mirovdost diafirîne.

Dema em qala xwendina bi Kurdî dikin, mijar hîn kûrtir dibe. Ji bo zimanekî mîna Kurdî ku bi salan di bin zextan de maye, xwendin ne tenê hînbûn e, di heman demê de parastina hebûnê ye. Li vir, giringiya avakirina komên xwendinê derdikeve pêş.

Xwendina bi komî, ziman ji çarçoveya pirtûkan derdixe û dixe nav jiyana rojane. Dema çend kes li hev dicivin û li ser pirtûkekê nîqaş dikin, ew zimanê nivîskî dibe zimanê axaftinê, zimanê ramanê û zimanê hestan. Komên xwendinê dibin dibistanên xwebexş. Di van koman de şêwezar, peyvên jibîrbûyî û qonaxên rêzimanî ji nû ve zindî dibin.

Yek ji feydeyên herî mezin ên komên xwendinê, pêşxistina çanda tahlîl û rexnegiriyê ye. Xwendina tenê carna dikare bibe xwendineke pasîf. Lê di nava komê de, dema mirov pirtûkekê tahlîl dike, ew neçar dimîne ku li ser struktur, karakter û peyama nivîskar hûr bibe.

Bi rêya tehlînê; Em fêr dibin ka nivîskar çima ev peyv hilbijartiye? Çima çîrok bi vî rengî bi dawî bûye?

Bi rêya rexnegirî jî gelekî muhîme em jib o xwe gihandinê me jî jib o xwed-dîtina nivîskêr. Rexne ne tenê dîtina kêmasiyan e. Rexneya durust, nîşandana cihê pirtûkê yê di wêjeyê de û nirxandina bandora wê ya li ser xwendevan e.

Ev pêvajo, hişê mirov ji dogmayan rizgar dike. Di komên xwendinê de, her endam bi nêrîneke cuda li pirtûkê dinêre. Nêrîna yekî dibe ronahî ji bo tarîtiya hişê yekî din. Bi vî rengî, pirtûkek dibe sedema bi sedan ramanên nû.

Ger em dixwazin zimanê me bibe zimanê zanist, huner û wêjeyê, divê em xwendinê bikin bingeha jiyana xwe. Avakirina komên xwendinê li taxan, li gundan, li zanîngehan û li ser platformên dîjîtal, erkeke neteweyî û mirovî ye. Xwendin, berxwedan e; xwendina bi komî jî, avakirina paşerojê ye. Werin em her pirtûkekê bikin hinceta hevdîtinekê û her hevdîtinekê bikin dibistana ziman û ramana azad. Ji bîr nekin, civaka ku naxwîne, nikare çîroka xwe bi xwe binivîse; lê civaka ku bi hev re dixwîne û nîqaş dike, tu carî nakeve bin nîrê tarîtiyê.

# ‘Li hemberî kêzikên ziyandar pêwîst e cotkar tedbîran bigrin’

**Beşa Parastina Şînatiyan li kantona Cizîrê ku bi hevkariya Meclisa Aborî û Çandiniyê serdanên meydanî li zeviyên genim ên gundewarê bajarê Qamişlo pêkanîne, diyar kir ku wan di hin zeviyan de kêzikên ziyandar dîtine û bang li cotkaran kir ku tedbîrên pêwîst wergirin.**

Esmêhan Gedro/Qamişlo

Bi armanca şopandina rewşa zeviyan li kantona Cizîrê, Beşa Parastina Şînatiyan li kantona Cizîrê bi hevkariya Meclisa Aborî û Çandiniyê serdanên meydanî li zeviyên genim ên gundewarê bajarê Qamişlo pêk anîn. Li gorî wan di çend zeviyan de kêzikên ziyandar hatine dîtin, ji ber wê jî beşa parastina şînatiyan bang li cotkaran kir ku rênimayan pêwîst bişopînin û tedbîrên wergirin, da ku cotkar kalîteya berhemên xwe û asta hilberînê biparêzin.

Komîteya Çandinî û Ajaldariyê ya kantona Cizîrê destnîşan kiriye ku tevahiya rûbera destûrdayî ji bo genimê avî di demsala çandiniyê ya heyî de ye di çarçoveya rêxistina çandiniyê de ku heta 15`ê Çileya 2026`an berdewam kir, gihîştiye nêzîkî milyonek û sê sed hezar donim, herwiha di vê demê de 23 hezar û 363 serlêdanên çandiniyê hatine tomarkirin. Wekî beşek ji çavdêriya berdewam a berhemên stratejîk, Komîteya Çandinî û Ajaldariyê, bi hevkariya Daîreyên Hilberîna û Parastina Şînatiyan, serdanên zeviyan li bajar û bajarokên Hesekê û Qamişlo berdewam dike. Armanc nirxandina rewşa heyî ya mezinbûna berhema genim e û rêbernameya teknîkî ya pêwîst ji cotkaran re peyda dike. Komîteyê ragihand ku berhema genim niha di qonaxa dirêjkirinê de ye, qonaxek girîng di çerxa mezinbûna şînatiyê de ku di dema wê de qurm dest bi dirêjbûnê dike û nîşanên erênî yên pêşketina berhemê nîşan dide.

### Serdanên zeviyên genim yên kantona Cizîrê

Beşêa parastina şînatiyan di serdanên xwe yên zeviyan de, derketina hin kêzikan bi taybetî kurmê stûna genim, dîtin. Ji bo sînordarkirina belavbûna kêzikên ziyandar û misogerkirina mezinbûna saxlem a berdewam a berhemê, rêzek rêbernameyên pêşîlêgirtin û dermankirinê ji cotkaran re hatin dayîn. Komîteyên çandiniyê piştrast dikin ku ev serdanên zeviyan dê di serdema pêş de jî berdewam bikin, da ku piştgirîya cotkaran bikin û berhema genim a herî baş bi dest bixin, bi vî rengî beşdarî xurtkirina ewlehiya xwarinê li herêmê bibin.

### Gera li nav zeviyan ji bo nirxandina rewşa giştî ya berhema genim

Beşa parastina şînatiyan a Komîteya Çandiniyê li kantona Cizîrê, bi hevrêziya şaxên xwe yên di komîteyan û yekîneyên berfirehkirinê de, gera li nav zeviyan pêk anî, ku hejmarek zeviyên genim li bajarên Qamişlo û Hesekê di nav xwe de digirt. Armanca vê gerê nirxandina rewşa giştî ya berhemên zivistanê, nemaze genim, bi çavdêriya rasterast a rewşa wan di zeviyan de û herwiha şopandina qonaxên mezinbûna wan û destnîşankirina pirsgirêkên herî girîng ên ku ew



dikarin pê re rû bi rû bimînin.

Beşa parastinê diyar kir ku di dema gerê de li ser tespîtkirina zû ya nexweşî û ziyandarên çandiniyê yên ku dikarin bandorê li hilberînê bikin, nemaze di bin şert û mercên avhewayê yên heyî de. Wê girîngiya van geran di piştgiriya cotkaran û peydakirina rêbernameya pêwîst ji bo parastina berheman û baştirkirina hilberînê de.

Ev hewldan beşek ji çavdêriya berdewam a sektora çandiniyê û xurtkirina tedbîrên pêşîlêgirtinê ne ku beşdarî parastina berhemên stratejîk ên li herêmê dibin.

# Ji bo dabînkirina nan hewildanên rêxistinkirina nangehan berdewam e

Lîloz Hisên/Qamişlo

**Hevserokê Komîteya Nangehan ya kantona Cizîrê Rondar Salih destnîşan kir ku gerên wan ji bo şopandina nangehan û kalîteya nan berdewam dike û got, “Mekenîzmeya proseya çêkirina nan di bin çavdêrî û şopandinê de ye, da ku li gorî pîvanên ku tê xwestin bighêje ber destê gel.”**



Nan yek ji xizmetguzariyên herî sereke yên jiyana rojane ya gel e. Wekî beşek ji hewldanên berdewam ên komîteya firneyan, Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê hewl dide ku hilberîna nan a berdewam û peydakirina wê bi kalîteyek baş ji bo welatiyan misoger bike. Di çarçoveya hêsankirina rewşa jiyanî ya gelê herêmê de, Komîteya Nangehan a girêdayî Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê kar û xebatên xwe yên rojane ji şopandina û çavdêriya nan ji destpêka proseya çêkirina nan heya gihaştina ber destê gel, berdewam dike.

Di dema dawî de, ji ber rewşa şer a ku herêm bi giştî tê de derbas bû, nemaze li kantona Cizîrê ku jimareke mezin ji koçberan berê xwe danê, zehmetiyeke mezin di aliyê jiyanê de derket pêş, nemaze kêmbûna madeya nan ya herî serke ye di nava civakê de.

Di vir de Komîteya Nangehan a kantona Cizîrê ya girêdayî Meclisa Aborî û Çandiniyê, bi hemû hewildanên xwe karîbû heya astekê vî barî li ser milet sivik bike. Hejmareke nangeh hatin vekirin wekî rewşeke tavilê ji bo dabînkirina nan. Gelek zehmetî derketin lê bi rêxistinkirina rast hatin derbas kirin.

Rewş û xebitandina nangehan ya heyî jî, bi awayekî baş û rêkûpêk ji bo dabînkirina nan û belavkirina wê li ser gel berdewam dike.

Derbarê berdewamiya hewldanên misogerkirina dabînkirina nan û belavkirina wê li ser gel, herwiha têkildarî xebatên nangehan, hevserokên Komîteya Nangehan a kantona Cizîrê Rondar Salih ji rojnameya me re axivî.

Hevserokên Komîteya Nangehan a kantona Cizîrê Rondar Salih di destpêka axaftina xwe de tekez kir ku xebatên Komîteya Nangehan wekî berê bi awayekî rojane berdewam e û wiha got: “Mekenîzmeya belavbûna nan û gihaştina wê ber destê welatiyan jî wekî berê ye, tu guhertin tê de çênebûye. Madeya ard û madeyên girêdayî çêkirina nan yên piştgirî li ser hemû nangehên giştî, nîvotomatîk û nangehên kevirî yên kantona Cizîrê tê belavkirin.”

### ‘Rojan e 520 ton ard li nangehan tê belavkirin’

Rondar Salih wiha berdewam kir: “Rojane nîzîkî 520 ton ard li ser hemû nangehên giştî û nîvotomatîk herwiha yên kevirî tê belavkirin. Canran rêjeya ard li gorî bîlançoyên ku ji meclisên bajaran û komînan dighêje me ku pêwistiya wan pê heye, zêde dibe, ji ber ku her bajarek rêjeya nan lê diyarkirî ye.”

Hêjayî gotinê ku hejmara nangehên ku niha li kantona Cizîrê dixebitin wiha ne: 14 Nangehên giştî, 100 nangehên nîvotomatîk û 20 nangehên kevirî. Ev nangeh bi awayekî rojane ji bo çêkirina madeya nan dixebitin.

### Mekanzîmeya kar berdewam e

Rondar Salih diyar kir ku mekenîzmeya xebitîna firneya jî wekî berê berdewam e û wiha anî ziman: “Komîteya Firneyan madeyên temwînê yên piştgirî û pêwistiyên girêdayî çêkirina nan li firneyên nîvotomatîk û giştî belav dikin wekî medeyên(ard, mazot, xemîrê, xwê û kîsên nan), ji xwe buhaya nan wekî berê ye bi 3 hezaran dighêje ber destê gel û tu guhertin dê tê de di pêşrojê de çênebe. Ev buha li hemû bajarên kantona Cizîrê tê firotin.”

Belavkirina nan di rêya meclisên bajaran, komîn û belavkerên ku ji hêla komînên hatine bilbijartin da ku bi awayekî dademnd li gel belav bike.

### Çavdêrî û şopandin

Komîteya Firneyan ji seat 3’ê sibehê ji dema destpêkirina proseya çêkirinan nan, di nava şopandin û çavdêriyê de ye, her roj komîteyên şopandinê tên avakirin, da ku çavêdêriya nan û belavkirina wê bê kirin, Rondar Salih wiha diyar kir: “Gerên me bi armanca şopandina kalîte, rêjeya xemirandinê, madeyên çêkirina nan da ku li gorî pîvanê ku tê xwestin derkeve herwiha jî nelîstina bi graniyê, belavkirina bi dadmendî û nelîstina bi buhayê nan, pêk tên.”

### Hişarî û muxalefet

Komîteya Firneyan giliyên gel werdigre û gavên pêwîst ji bo çareserkirina wan davêje. Herwiha komîte belavkerên nan dişopîne da ku piştrast bike ku nan bi dadperwer û rêkûpêk digihêje gel di heman demê de dema ku xwediyên nangehan pebendî bi perspektîfên ku têne derxistin nebin an pîvanên ku hatin dayî, hişyarî ji wan re tê dayîn û di dawî de jî muxalefe, hevserokê Komîteya Firneyan Rondar Salih ev yek piştrast kir û wiha gotina xwe qedand: “Me hewil da ku seatên nangehan rêxistin bikin da ku di seatên dereng ê êvarî neyê belavkirin. Em gilî û gazinên milet jî li ber çavan derbas dikin û bersiva wan didin ji bo çareserkirina pirsgirêkan herwiha ji bo çareserkirina her zehmetiyek têkildarî belavkirin an jî kalîteya madeya nan gilî û pêşniyarên welatiyan werdigire.”



# Piştî 7 salan vegera koçberên Serêkaniyê rojev e

**Endamê Komîteya Koçberên Serêkaniyê Mihemed Haco diyar kir ku di çarçoveya pêkanîna Peymana 29'ê Çileyê de, vegera koçberan yek ji rojevên sereke ye, ji bo vegera koçberên Serêkaniyê jî, divê tiştên bingehîn ji koçberan re bên dabînkirin, çete û malbatên wan ji bajêr bên derxistin, hêzên ewlekariyê ji bajêr bi xwe bin û nabe kesên ji derve wê bi rê ve bibin.**

Ronahî Sadûn/Hesekê

Derbarê rewşa Serêkaniyê berî dagirkirinê û piştî wê, herwiha vegera koçberên wê bi rengekî ewle di çarçoveya peymana 29’ê Çileyê de, endamê Komîteya Koçberên Serêkaniyê Mihemed Haco bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Rewşa bajarê Serêkaniyê bi giştî berî dagirkirinê û rewşa wê niha piştî dagirkirinê çawa ye?**

Rewşa bajarê Serêkaniyê berî dagirkirinê gelek baş bû. Cara yekem di dîroka Serêkaniyê de, bajar ji aliyê ewlekarî, pêşketin, bazirganî û di hemû aliyan de bi sîstem hatibû avakirin û karekî gelek baş di hundirê bajêr de hatin kirin. Heta mirov dikare bibêje ku tu kes di bajêr de bêkar nema bû. Di aliyê pêşesaziyê de jî gelek gavên mezin hatin avêtin, taybetî piştî şerê yekem ê sala 2012’an ku li Serêkaniyê çêbû. Piştî ku herêm hate rizgarkirin, di hundirê bajêr de jiyaneke nû dest pê kir, jiyaneke ku yekem car di tevahiya Sûriyê de hemû pêkhateyên wê bi hev re meclis, hêzên xwe yên parastinê, saziyên perwerdeyê û hwd, ava kirin. Her kesî jî xwe di nava xwerêvebirina xwe de cih girt. Ji sala 2012’an heta 2019’an, di navbera 7 salan de, ev pêşketin hatin bidestxistin. Dibe ku di bajarên din de ev pêşketin di deh salan de jî neyên bidestxistin, lê li Serêkaniyê ev pêk hat. Di heman demê de, ew wekî bajarekî bi pêkhateyên xwe yên cihêreng hat naskirin. Her çendî berê rejîma Baas xwestibû ku di navbera Kurd û Ereban de fitnê ava bike, ev hewl pêk nehat. Bi rastî, Rêveberiya Xweser û saziyên girêdayî wê ya bajêr ev planên Baasê pûç kirin. Berovajî wê cûdahî di navbera pêkhateyan de nehat çêkirin, beramberê wê, gel bi hev re parastin Bajarê Serê Kaniyê kirin. Di Serêkaniyê de şaristaniya ku em behsê wê dikin ku ji Til Helefê dest pê kiribû, beriya dagirkirinê dihate dîtin. Ji ber vê yekê, dewleta Tirk û komên çeteyên wê ev pêşketin wekî metirsî li ser xwe dîtin, ji ber ew naxwazin deverek pêşketî û jiyaneke ewle ava bibe. Li ser vê bingehê, piştî rizgarkirina yekem a Serêkaniyê, dewleta Tirk bi gelek awayên veşartî xwest tevliheviyê di bajêr de çêbike, lê ev hewl nediçûn serî, ji ber hişmendî û pêşketina gelê hebû. Ji bo vê yekê, di sala 2019’an de bi rengekî leşkerî û bi piştevaniya gelek komên çeteyan, êrişî Serêkaniyê kir. Di encamê de, ji sedî 80 gel koçber bû. Piştî dagirkirina Serêkaniyê, gelek guhertinên çêbûn. Li wir jiyan bi temamî hate rawestandin. Êdî dizî, talan, xirabî, destdirêjî, şewat û metirsî bi awayekî rojane di navbera xelkê de belav bûn. Herwiha piraniya xelkên li wir ne yên resen bûn. Serêkaniyê bû bajarekî ku bi hovîtî dihate jiyankirin, ewlehiya wê qet nedihate dîtin. Rojane nûçeyên li ser destdirêjî û zordariyên çeteyan li ser xelkê têne belavkirin. Jin dihatin kuştin, revandin û destdirêjî li wan dihat kirin, ev tişt li ber çavên her kesî çêdibû. Di heman demê de, ew bajarê ku berê bi rengê xwe yê xwezayî dihate naskirin, êdî ne hat pêşxistin. Berovajî wê bi awayekî mezin hate xirabkirin. Navên taxan û dibistanan hatin guhertin ku ev yek bû tiştekî gelek balkêş. Bi taybetî taxên Kurdan hatin tunekirin wêrangandin. Li Serêkaniyê piştî dagirkirinê gelek pirsgirêk û xerabî çêbûn. Kesên temenmezin ên li wir mayîn, pir caran digotin: “Xwezî em vegerîna rojên berê.” Di demên Rêveberiya Xweser de, rewşa bajarê Serêkaniyê baştir bû. Ji ber yên hatine Serêkaniyê birêve dibin giropên çete ne û bi dewleta Tirkiyê ve girêdayî ne, hişmendiya wan ne ji bo avakirin, ji bo xerabkirin û tunekirina hevbeş li vî bajarî ye. Ev yek ne tenê li ser Kurdan, lê li ser xelkê Ereb jî hatiye dîtin û isbatkirin. Kesên ku niha diçin Serêkaniyê û bi çavên xwe dibînin, dibêjin ku di van 7 salan de tu gav ji bo avakirina wê nehat avêtin. Berî dagirkirinê rewşa wê pir baş bû, lê piştî dagirkirinê, bajar bi destê çeteyan hate vegerandin weke ku sed sal paşve çûye.

**Gelo zemînekî vegereke bi ewle ji bo koçberên Serêkaniyê hatiye dayîn, bi taybet di çarçoveya peymana 29’ê Çileyê ku pêwîst e hemû koçber vegeriyabana cih û warê xwe, lê ji bo koçberên Serêkaniyê çima ev zemîn nehatiye dayîn?**

Ji bo vegerê bi rengê ku kî bixwaze vegere, ev yek ne pêkan e. Em dizanin ku di destpêka sala 2026’an de li Rojavayê Kurdistanê gelek guhertinên siyasî û leşkerî çêbûn. Di nav van guhertinan de, di encama wan şer û pevçûnên ku li herêmê çêbûn, di 29’ê Çileyê de peymanek di navbera Hêza QSD û hikumeta demkî ya Sûriyê de hat çêkirin. Di vê peymanê de gelek xal hatin diyarkirin, yek ji wan jî ew bû ku hemû koçber vegerin cih û warên xwe. Niha zêdetirî 3 mehan li ser wê peymanê derbas bûne, lê heta tu amadekariyên rastîn ji bo vegera xelkê nehatiye kirin. Hîn jî ew komên çete li wir hene, ew kesên ku li dijî xelkê komkujî kirine. Herwiha ew kesên ku berê bi navê DAIŞ li dijî Kurdan şer dikirin û hem jî bargehên Tirkiyê li bajêr hene. Di peymana 29’ê Çileyê de hat gotin ku divê xelk vegerin, lê di rastiyê di hundirê Serêkaniyê de hikumeta demkî ya Sûriyê ne xwedî biryarek serbixwe ye. Biryar bi temamî di destê dewleta Tirk û komên çete yên pê ve girêdayî de ye, heger Tirkiye bixwaze, ew dikarin jê vekişin û heger naxwaze, venakişin. Ji ber vê yekê hîn jî gef li gelê Kurd tê xwerin. Xelkê me jî dizane ku ger vegerin, mal û milkên wan hatine dizîn û talankirin, heta di gelek cihan de mal ji binî ve hatiye hilweşandin an jî şewitandin. Lewma ji bo vegera xelkên Serêkaniyê, hîn tu zemînekî rastîn û berbiçav nehatiye amadekirin.

**Niha gelek malên li gundewarên Serêkaniyê û bajêr bi xwe bûne kavil, heya çi astê ev binpêkirin hatine belgekirin û bi destê kê ev yek tê kirin?**

Di demên dawiyê de hinek Erebên ku gundên Serêkaniyê dagir kiribûn, vegeriyan cihên xwe li Tebqa, Reqa û Dêrazorê. Di çûna van malbatan de, hinek malbatên Kurd xwestin herin herî kêm rewşa gundên xwe bibînin. Lê dema çûn, bi çavên xwe dîtin ku ji sedî 30 malên Kurdan hatine şewitandin, bîrên avê birine û erdên çandiniyê hemû hatine xirabkirin. Ev xelk ji bo ku rastî vegere bajar û gundên xwe, bi salan dem ji wan re pêwîst e. Heta ku vegera Serêkaniyê pêk were, ev hemû pirsgirêk wek astengên mezin li ber vegerê dimînin. Ev tiştên ku di hundirê Serêkaniyê de çêbûn jî em wek komîte dişopînin, hem ji bo ragindandinê em parve bikin û hem jî weke dosya em dixin destê kesên peywendîdar. Herwiha me ev dosyayên belgekirî radestî berpirsên hikumeta demkî ya Sûriyê û parêzgarê Hesekê kirine. Wan jî gotiye ku ew ê vê mijarê bişopînin û binêrin çawa ye. Lê heta niha tu gavên pratîkî di derbarê wan kesên ku sûc li hemberî malên Kurdan û gelê Kurd kirine de, nehatine avêtin, tu biryarekî di derbarê wan de jî nehatine girtin. Ev jî tirsê dixe dilê gel, dibe sedem ku baweriya me bi vê rêkevtinê li gel hikumeta demkî ya Sûriyê kêm bibe. Ji ber ku di dawiyê de ev komên çete bi giştî bi hikumeta demkî ve girêdayî ne, lê biryarên wan dewleta Tirkiyê didin.

**Rewşa koçberan di Kampê de çi ye û çiqasî zor û zehmetiyan dikşînin?**

Di encama êrişên ku li ser Serêkaniyê çêbûn de, zêdetirî 35 hezar koçberên me niha di kampan de jiyan dikin. Piraniya wan li Kampên Waşokanî û Serêkaniyê hatine belavkirin, beşek jî li Kampa Newrozin. Zêdeyî 7 hezar û 500 kes jî li dibistanên Hesekê, Til Temir û gundewarên wan jiyan dikin. Ev 7 sal in ku di nava rewşekê zor û zehmet de jiyan dikin. Havîn gazinca gerimbûnê dihat kirin, ji ber ew konê wan 7 salan nehatine guhetin. Îsal jî bi sedema barîna barana zêde av ket nava konan, herwiha hinek koçberên me yên di kampan de xaniyên biçûk ava kirin, lê ev barana zêde bû sedem ku wan xaniyan hilweşîne. Lewra xelk bêçare bûn ku careke din ji kampê derkevin û berê xwe bidin dibistanan, da ku li wir bi cih bibin. Her kesî jî dît ku koçber di çi şert û mercan de jiyan dikin. Bi taybetî, piştî wan êrişên li ser herêmê, alîkariya ku ji bo koçberên Serêkaniyê dihate pêşkêşkirin, qut bûye. Ji ber vê yekê niha rewş gelekî zehmet e û xelk êdî nikarin debara xwe bikin. Gelek kes dixwazin rojekê vegerin bajarê xwe, da ku ji van şert û mercên dijwar xilas bibin. Di heman demê de zehmetiyên xelkê gelek in, kar tune ye, dorpêçeke aborî li ser herêmê heye û her tişt bûha bûye. Ji ber vê yekê, gelek kes bêçare dibin ku alîkariya ku tê pêşkêşkirin bifroşin, da ku bikaribin tiştên herî pêwîst ji xwe re



bikirin. Hin kes jî di kampê de avê ji xwe re dikirin, ji ber ku rewşa avê li Hesekê pir xerab e û ev yek bi taybetî li ser koçberan bandoreke mezin dike. Ji ber xizmetên tenduristiyê yên ku berê dihate pêşkêşkirin, ji destpêka 2026’an vir ve kêm bûne.

**Xebatên we ji bo vegera koçberan di çi astê de ye?**

Di sala 2021’an de komîteyek bi navê Komîteya Koçberên Serêkaniyê hat avakirin. Komîteya me jî, di van salan de karîbû gelek dosya û binpêkirinên ku di hundirê bajêr de hatine kirin berhev bike û radestî berpirsan bike. Heta niha gelek raporên navdewletî jî sûcên li Serêkaniyê li ser bingeha belge û raporên me tomarkirin û ji bo raya giştî parve kirin. Niha rojeva herî sereke ji bo me ev e ku em xelkê xwe vegerînin. Em civînan bi parêzgarê Hesekê, şandên hikumetê û rêxistinan re lidar dixin, ji bo ku şertên vegerê werin çêkirin. Xelk bê alîkarî nikare vegere, herî kêm divê tiştên bingehîn bên dabînkirin. Me ji berpirsên ewlekariyê daxwaz kiriye ku rêyên Serêkaniyê bêne vekirin û mayînên hatine çandin bên rakirin. Herwiha, em daxwaz dikin ku komên çeteyan û malbatên wan, ji herêmê bên derxistin. Ez bawerim ku di van rojan de jî dê hin gavên erênî ji bo xelkê Serêkaniyê werin avêtin. Hêzên Ewlekariya Hundirîn diyar kirin ku ew ê herin bajêr û rê vekin, da ku gav bi gav xelk vegere. Lê daxwaza sereke ya xelkê ev e, dibe ku hêzeke ewlekariya nû bê avakirin, lê divê ev hêz ji xelkê wî bajarî be, nabe ku kesên ji derve bên û herêmê rêvebibin. Daxwazên me jî wek komîte ev e tu kes bi serê xwe neçe Serêkaniyê. Ji ber çarenûsa me yeke, divê em bi hev re berê xwe bidin Serêkaniyê. Salên dirêj çû û demên pir kêm mane, em bi hêvine ku bi awayekî destpilîn bi hev re vegerin ji bo misgorkirina mafê xwe yê rewa pêk bînin.

# ‘Hevgirtina partî û gelê Kurd hêza parastina mafên rewa xurtir dike’

Sekretêrê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriye Ciwan Siko da zanîn ku gelê Kurd li Rojhilata Navîn roleke girîng dilîze û hevgitina Kurdan wê bingeha bidestxistina mafê netewî, siyasî û çandî be, herwiha hevgirtina partî û gelê Kurd wê hêza parastina mafê rewa xurt bike.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Doza Kurdî û yekrêzî di berdewambûna geşedanên siyasî li Rojhilata Navîn de, mijareke sereke ye, yek ji her sê aliyan ango doza Kurdî, yekrêziya partiyên Kurdî û geşedanên herêmê ber bi riyên çareseriyê ve naçin, derbarê heman mijarên serborî sekretêrê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriye Ciwan Siko bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Wekî tê zanîn Rojhilata Navîn di nava agirê şer de ye, ev rewşa tevlîhev çawa bandorê li Kurd û Kurdistanê dike û gelê Kurd roleke çawa dilîzin di vê derbarê de?**

Gelê Kurd li Rojhilata Navîn roleke girîng û dîrokî dilîze, ev herêm jî bi pirrengiya, ol, çand û netewan, hem jî pevgirêdaneke erdnîgarî û siyasî naskirî ye. Kurd ji netewên resen ên vê erdenîgariyê ye û li beşekî vê herêma ku li nava çend dewletan de dijîn, vê yekê jî hişt doza wan bi awayekî rast bi geşedanên siyasî û ewlehiyê yên qonaxên dîrokî yên cuda ku herêm tê re derbas dibin. Di nava deh salên dawî de Kurd wekî netewên din ketin bin bandora pevçûnên herêmî û navxweyî, vê yekê hişt ku doza Kurdî berz bibe weke dozeke siyasî û dîrokî ku bi mafê niştîmanî, çandî û siyasî ve were girêdan. Lêkolîner û şîrovekar dibêjin ku ev doz bi rengekî mayinde û wekhev heya roja îro nehatiye çareserkirin, vê yekê jî hişt ku bibe dozeke domdar û li dengeyên herêmî bandorekê ava bike. Li ser vê bingehê tê dîtin ku aramiya herêma Rojhilata Navîn bi hemû rengan pêknayê heya ku doza Kurdî bi awayekî adil û bi giştî neyê çareserkirin, ev çareserkirin jî bi mercê ku mafê Kurdan di çarçoveyeke aştiyane de, li gorî xwestekên gelê Kurd yên rewa bin, hem jî yekrêziya gel û welatan û aramiya wan bên parastin. Bi hebûna çareseriyeke adil û giştî ji bo doza Kurdî ya dîrokî vê yekê destnîşan dike ku ev doz dibe faktoreke sereke di warê tevlîheviyan de û dibe sedemeke sereke ji bo xurtkirina asta baweriyê di nava gelên herêmên yên cuda de. Çareserkirina vê pirsgirêkê jî pêdivî bi nêzîkbûneke rasteqîn heye ku li ser bingeha diyaloga siyasî û têgihiştina hevpar, dûrî tundûtûjiyê û paşguhkirinê be û li gorî pêşketinên herêmî û navnetewî be. Ezmûnên dîrokî yên li Rojhilata Navîn nîşan didin ku çareseriyên domdar ne bi hêz an pevçûnan tên, lê bi rêya çareseriyên siyasî yên ku mafên hemû aliyan li ber çavan digirin û di rêvebirina cihêrengiyê de hevkariyek rasteqîn ava dikin. Di vê çarçoveyê de, mirov dikare bibêje ku rola Kurdan di pêşeroja Rojhilata Navîn de ne tenê bi aliyeke ku ji bûyeran bandor dibe, lê ew dikarin di avakirina aramiyê de jî bibin hêmanekî çalak eger şert û mercên siyasî yên guncaw werin peydakirin û mafên wan bi wekhevî û dadwerî werin naskirin. Qebûlkirina cihêrengiya neteweyî û çandî û birêvebirina wê ya rast yek ji bingehên sereke ji bo her projeya aramiyê ya rastîn li herêmê ye. Ji ber vê yekê, çareserkirina pirsgirêka Kurd bi awayekî adilane û aştiyane li gorî vê nêrînê beşeke girîng a berfireh a ku armanc dike aramiyê li Rojhilata Navîn pêkbîne, li gel pirsgirêkên din ên siyasî, aborî û ewlehî yên ku li herêmê rû bi rû ne, tê hesibandin.

**-Li cem Kurdan stratejiyeke bêhempa heye ew jî yekrêzî ye, dîrok şahidê vê yekê ye nemaze yekrêziya ku berî demekê li hember êrişên Rojava çêbû, çi dibe asteng li pêşiya paşveçûna hestên yekrêziya Kurdî bi taybet li nav partiyên Kurdî?**

Yekîtî û hevgitina gelê Kurd yek ji stûnên herî bingehîn ji bo bidestxistina daxwazên xwe yên netewî, siyasî û çandî tê hesibandin, bi taybetî di ronahiya qonaxa hestiyar a ku herêm bi giştî û Sûriye bi taybetî tê de ye. Dîrok îsbat kiriye ku her destkeftiyeke siyasî an jî îdarî ya ku ji bo gelê Kurd pêkhatiye, rasterast encama têgihiştin û hemahengiya di navbera pêkhate, partî û hêzên cuda de ye. Xurtkirina girêdana di navbera Kurdan de li herêmên cuda û dîasporayê pêwîstiyeke ku divê bi awayekî bi lez çêbibe, ji ber ku diyalogê û hêza parastina mafên rewa xurt dike, hem jî rê li ber parçebûnên navxweyî ji aliyê aliyên din ve digire. Tecrûbeya li herêmên wekî Rojava jî nîşan dide ku piştgirî û çalakiyên hevbeş dikare rewşa siyasî û ewlekariyê bi rê ve bibe tevî hebûna zehmetiyên mezin. Di vê çarçoveyê de, pêwîstiya lezgîn bi xebateke cidî û berpirsiyar derdikeve holê ji bo avakirina lêvegereke yekgirtî ya Kurdî ku wek bingeheke netewî be û hêzên siyasî û civakî yên cur bi cur di nav xwe de bigire û îradeya gelê Kurd bi rengekî hevgirtî nîşan bide, bi taybetî piştî guhertinên ku Sûriya nû derbas bû. Hêjayî gotinê ye ku tecrûbeya sîyasî ya Kurdan di deh salên borî de nîşan dide ku meylên hizbayetî yên teng gelek caran li pêşiya bidestxistina pêşketinên rastîn ên di mijara yekîtiyê de asteng bûne, ji ber ku fikrên rêxistinî carinan ji berjewendiyên neteweyî yên giştî girantir in. Nakokiyên navxweyî jî ji bandorên herêmî û navneteweyî yên tevlihev nehatine veqetandin, bûne sedema kûrbûna nakokiyan di navbera partiyên siyasî de û hişt hin hêz ji bo berjewendiyên xwe û ajandeyan derkevin pêş. Berevajî vê, derbaskirina van pirsgirêkan hewceyî hişmendiyeke siyasî ya bilind û îradeyeke rastîn e ji bo berjewendiyên gelê Kurd bibin li ser hemû berjewendiyên teng. Herwiha pêwîstî bi xebateke heye ji bo parastina biryardayîna Kurdan da ku nekeve bin bandorên derve, ev yek jî bi rêya serxwebûna biryardariyê û pêşxistina çanda diyalog û hevkariyê pêkan e. Di encamê de qonaxa niha daxwaz dike ku diyalog û têgihîştin di ser her tiştî re be û berjewendiyên neteweyî yên bilindtir li ser hesabên teng ên hizbî danîn û bi hestekî berpirsiyariya dîrokî xebat ji bo avakirina helwesteke yekgirtî ya Kurdî ku hêjayî qurbanî û daxwazên rewa yên gelê Kurd be.

**-Di nav van geşedanên xeternak de, hevgirtina Kurdî rêya xelasiya gelê Kurd ji komkujiyan e, heya ku ev yek pêkwere, mafê gelê Kurd û destkeftî werin parastin pêwîst e partiyên siyasî çi gavan bavêjin?**

Li gorî nêrandina Kurdî ya berfireh ya ku bûye rojeveke siyasî û fikrî ya hin aliyên ku guhdanê bi rewşa giştî ya herêmê dikin, em dikarin bêjin ev qonax qonaxeke hestyar e û ji qonaxên herî hesas a ku gelê Kurd tê re derbas dibe, hem li Sûriyê û hem jî bi tevahiya herêmê. Ji ber ku di vê qonaxê de astengî, arîşeyên navxweyî û guhertinên herêmî-navdewletî rastî hev tên, di heman demê de derfet û xeter bi hev re tên, ev yek jî berî niha di dîrokê de dubare nebûye. Di heman çarçoveyê de parastina destkeftiyan ne tenê bi hin gavên biçûk an jî kiryarên demkî pêkan dibe, lê bele bi nerandineke siyasî ya berfireh li ser bingeheke tekûz tê bidestxistin. Yek ji xalên



herî girîng ên ku di vê çarçoveyê de pêkanîna wê divê were misogerkirin, mijara yekkirina îradeya siyasî ya Kurdî di nav çarçoveyeke berfireh de ye, çi weke lêvegera Kurdî, çi weke encûmena siyasî ya yekbûyî an jî formuleke din a lihevhatinê be da ku ev yek bikaribe di navbera hêz û tevgerên cuda de îfade bike. Ev mijar wekî pêwîstî tê dîtin û ne vebijarkeke ku mirov hilbijêre, ji ber ku parçebûna siyasî bi gelemperî dibe sedema qelsbûna şiyana danûstandinan û dihêle destkeftî rastî xeteriya hilweşînê werin. Ji aliyê din ve, hişmendiyek mezin heye dibêje mafên biçûk an gavên îdarî çi qas erênî bin jî eger ew di destûra bingehîn de neyên wergerandin, nikarin garantiyeke mayînde pêkbînin. Ji ber vê yekê, divê li ser girîngiya derbasbûna ji qonaxa “hêsankirin an biryarnameyan” ber bi qonaxa misogerkirina destûra bingehîn ve bê sekinandin, ji ber ku destûr tekane çarçoveya ku mafan misoger dike ye û li gorî şert û mercên siyasî wan ji guhertin an betalkirina wan diparêze. Di vê çarçoveyê de, her gavek erênî, wekî hin biryarname an peymanên beş bi beş, wekî destpêka pêvajoyê tê dîtin, lê heta ku di nav destûrê de neyê temam kirin, ew wekî serkeftina dawîn nayê hesibandin. Di encamê de, nêrîna Kurdî ya ku di vê çarçoveyê de pêktê, xwe dispêre wê fikra ku pirsgirêka Kurdî li Sûriyê gihîştiye qonaxeke ku pêwîst e ji rewşa belavbûn û perçebûnê ber bi dewleteke rêxistinbûyîna sazûmanî ya yekbûyî, ji destkeftiyên demkî ber bi mafên destûrî yên mayînde û ji bersivên reaktîf ên plansaziya stratejîk a demdirêj were veguhestin. Di çarçoveya vê têgihiştinê de lêvegera Kurdî wek amûreke siyasî ya yekbûyî tê pêşniyarkirin, destûr weke garantiya dawîn tê pêşniyarkirin û reforma navxweyî jî weke şertekî bingehîn tê pêşniyarkirin, ev her sê hêman di projeyeke yekane de bi armanca parastina hebûna siyasî, çandî û neteweyî ya gelê Kurd û berdewamiya wê di pêşerojê de misoger dibe.

## Ji vî şerî dê aştî derkeve?



**E.Pêjder Altan**

Şerê Îran, DYA û Îsraîlê, hincetên ku di ragihandinê de derdixin pêş û kiryarên dikin qet hev nagirin. Ji ber her sê alî û alîgirên wan jî di retorîkek pir tarî û balkêş hene ku dixwazin dawiya mirovahiyê bînin. Her sê alî jî dixwazin bi kaoseke mezin rizgarkerê (xilaskarê) xwe bînin ser rûyê erdê. Dema em ji aliyê Îsraîlê ve lê dinêrin, ‘li benda wêrankirinê ne da ku perestgehê ji nû ve ava bikin.’ Li ser Îsraîlê ne tenê siyasetmedar hewl didin ku axa xwe biparêzin; di heman demê de komeke olî ya radîkal jî heye ku dixwaze pêvajoya hatina xilaskarê xwe bilezîne. Berê, baweriyên olî li gorî rêza “Xwedê kengê bixwaze jixwe wê rizgarkerê me bişîne, tenê em zêde xwe tevnedin’ bûn, lê tundrewên heyî bawer dikin ku divê xilaskar neçar bimîne ku were ser rûyê erdê. Lîsteyek wan a zelal a tiştên ku bikin heye. Tiştê herî xeternak a di vê lîsteyê de jî di dilê Qidusê de ye. Li gorî baweriyên wan, ji bo ku xilaskarê li bendê be were û bihuştê li ser rûyê erdê ava bike, divê Perestgeha Silêman tam li cihê ku Mizgefta El-Eqsayê, yek ji cihên herî pîroz ji bo Misilmanan lê ye, ji nû ve were avakirin. Bê guman, ew dizanin ku gavek wusa dê tevahiya cîhanê, nemaze cîhana Îslamî, aciz bike û şerekî gerdûnî yê mezin bide destpêkirin. Lêbelê, balkêş e ku ew dixwazin tam ev şerê mezin derkeve holê. Çima? Ji ber ku ew bawer dikin ku dema hemû cîhan li dijî wan bibe yek û ew kêliya xwe ya herî bêhêvî bijîn, hêza ku ew li bendê ne dê ji ezmanan dakeve û hemû dijminên wan tune bike. Ji ber vê yekî mirina mirovên sivîl bê guneh ne xema wan de ye.

Kiryara duyemîn DYA’yê vedihewîne. Bêyî ku pir dûr biçim, wêneya 5ê Adarê bi tena serê xwe çîrokeke hişyariyê ye. Nêzîkî bîst kesayetên olî destên xwe danîn ser milên Trump û dua kirin. Bi vî awayî, wan Trump ne tenê wekî serokkomarekî hilbijartî, lê wekî rêberekî “îlahî” yê xwedayî îlan kirin. Ji aliyekî din ve, DYA, piştgirê herî mezin ê Îsraîlê, nikare helwesta xwe di van pevçûnan de tenê bi firotina çekan, bombebarankirinê, an kontrolkirina rêyên petrolê rave bike. Xêzeke radîkal a Xiristiyan a pir bihêz heye ku di nav damarê artêş û siyaseta DYAyê de cih girtiye. Ev kom xwînrijandina li Rojhilata Navîn ne wekî pirsgirêkek jeopolîtîk, lê bi rastî wekî têkoşînek pîroz ji bo vegera Îsa dibîne.

Beşa sêyem Mehdîyê Îranê nîşan dide; Çîna serdest a Îranê jî şerê bi DYA û Îsraîlê re tenê wekî şerekî sînor an bandorê nabîne. Li gorî rêgezên Îslama Şîe, ev nêzîkatî welatên ku ew dijmin dibînin wekî xuyangên Şeytan li ser Erdê dibîne û şerê wan tê wateya amadekirina erdê ji bo vegera rêberê olî yê rastîn ê windabûyî, Mehdî.

Ew bawer dikin ku ji bo ku rêberê ku li bendê ye were û edaletê bîne cîhanê, divê cîhan pêşî bikeve nav neheqî, zilm û kaosek mezin a bêkêmasî. Ji ber vê yekê, aştî an lihevhatin bi tevahî bi armancên olî yên vê komê re li hev nayê. Wekî din, ji bo ku di şer de wêranî an windahiyên mezin bijîn, ji bo wan têkçûnek nine; Berevajî vê, ew mirina ji bo baweriyên xwe wekî destkeftiyek pir hêja dibînin û ji ber vê yekê bi rastî jî ji mirin û êşê bêpar in. Niha, motîvasyona herî xurt û hêza yekgirtî li Îranê baweriya nûkirî û xurtkirî ya bi hatina Mehdî ye, ku ji hêla vî şerî ve tê xurt kirin.



# Gelo dixwazin careke din DAIŞ’ê zindî bikin?

Çawa ku di sala 2014'an de bi destê hin hêzên herêmî û navnetewî DAIŞ bi serkêşiya Ebû Bekir Elbexdadî hat avakirin, niha jî heman sînaryo li Sûriyê û Iraqê bi serbestberdana çeteyên DAIŞ'ê û cihgirtina wan di nava artêşa Sûriyê de, tê dubarekirin.

**Stêrk Mihemed**

Di sala 2014’an de bi piştgiriya hin hêzên herêmî û navnetewî, DAIŞ’ê xwe wekî xîlafet li Iraq û Sûriyê ragihandin û Ebû Bekir Elbexdedî ji zindana terorê ya Boca hat berdan û wekî serokê rêxistina terrorist hat tayînkirin û komkujiyên mezin li dijî mirovahiyê pêk anîn û li ser tevahî cîhanê bû xeter, ji xwe heta roja îro jî xeteriya çeteyên DAIŞ’ê berdewam e. Eger em serdema destpêka derketina DAIŞ’ê bi bûyerên ku niha li Sûriyê diqewimin hevrû bikin, wê xuya bibe ku planeke nû ji bo bihêzkirina çeteyên DAIŞ‘ê heye. Piştî êrişên hikumeta demikî a Sûriyê li ser Rojavayê Kurdistanê, çekdarên girêdayî hikumetê yekser berê xwe dan girtîgeha Şedadê û kampa Holê û çeteyên DAIŞ û malbatên wan berdan, di heman demê de gelek serkirdeyên DAIŞ’ê cihê xwe di nava artêşa Sûriyê de girtin. Di vê dema niha de em dibînin ku sîneryoyên ku li Îraq û Sûriyê di 2014-2019’an pêk hatin, niha tên dûbarekirin. Ji xwe di nava pilanê de hêzên navnetewyî cihê xwe digirin, lê pirsa girîng ew e; gelo xwasteka wan vegerandina serdema Ebû Bekir Elbexdedî ye?

**Ebû Bekir Elbexdadî kî bû?**

Ebû Bekir Elbexdadî navê wî yê rast Ibrahîm el-Bedrî ye, ew di sala 1971’an de li Samarra Iraqê ji dayik bûye. Di sala 2013’an de wî damezirandina DAIŞ’ê ragihand û di sala 2014’an de li Mizgefta El-Nûrî ya Mûsilê xwe wekî “xelifê” hemû misilmanan îlan kir. Beriya DAIŞ’ê, endamê El-Qaîde li Iraqê bû û di sala 2004’an de ji aliyê hêzên Amerîkayê ve li Kampa Bucca hatibû girtin . Di 26’ê Cotmeha 2019’an de, di operasyoneke taybet a hêzên Amerîkayê de li gundê Barişa yê Idlibê ya Sûriyê hat dorpêçkirin û bi teqandina êleka xwe ya xwekujiyê hat kuştin .Piştî mirina wî, rêxistinê DAIŞ’ê Ebû Îbrahîm el-Haşimî el-Qureyşî wekî serokê nû hilbijart.

Ebû Bekir Elbexdadî di nava rêxistinên radîkal de gav bi gav bilind bû, lê çend kes û navendên sereke hene ku rê li ber wî vekirin û pêşengtî danê. Bexdadî di destpêkê de tevlî koma Zerqawî (El-Qaîde li Iraqê) bû. Zerqawî bingeha hovîtî û stratejiya şerê mezhebî ava kir ku Bexdadî paşê ew wek mîrat girt. Piraniya pispor dibêjin ku pêşengê rastî yê Bexdadî girtîgeha Bucca bû. Ew di sala 2004’an de li wir hat girtin. Di wê kampê de, wî bi efserên artêşa Sedam Husên weke (Hecî Bekir) û serokên din ên El-Qaîdeyê re peywendî danî. Tê gotin ku wî li wir fêrî rêbazên serkêşiyê kir.

Di 2014’an de bi pêşangtiya Ebû Bekir Elbexdedî fermana 74’an li ser gelê Şengalê pêkhat, li Şengalê gel di komkujî û qeyranan re derbas kirin. Jin, mêr, zarok û kesên bi teman mezin hatin kuştin û revandin. Di heman demê de jin hatin revandin û firûtin heya niha jî hin ji jinên êzidî ne xuya ne. Piştî Şengalê xwastin ku plane xwe ya qirêj û ji bo berfirehkirina rêxistina DAIŞ’ê berê xwe dan Kobanê ku ew jî bi feermana Ebû Bekir Elbexdedî bû. Xwastin ku Kobanê ji hemû aliyan ve tune bikin û din serweriya xwe herwiha armac dikirin ku navê wê bikin (Eyn El Îslem) çawa ku niha hikumeta demkî dixwaze bike (Eyn Ereb) lê Kurdan planên wan û xelîfeta wan têkbirin.





**Dubarekira sîneryoya Ebû Bekir Elbexdedî li Sûriyê û Îraq**

DAIŞ ku hêza herî xeter di cîhanê de ye li Rojavayê Kudistanê bi têkoşîna şervanên YPJ, YPG, QSD’ê û berxwedaniya gelê Rojava têkçûn. Bi salan hêzên QSD’ê karîbûn ku cîhanê ji hêzên terorîst biparêzin. Lê piştî hilweşîna Rêjîma Baas û hatina hikumeta demkî a Sûriyê li ser desthilatdariyê re rewş hate guhertin. Bi êrişên xwe yê di çileya 2026’an de li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê re hin kamp û zindanan ku çeteyên DAIŞ’ê têdene ketin destê hikumeta demkî herwiha ew çeteyên di zindana de ku destê wan di qirkirina mirovahiyê de heye û kampa hole ku bi hezaran ji malbetên DAIŞ’ê têde hene ku weke kampa herî xeter piştî Bucca ya Ebû Bekir Elbexdedî têde bû hemû serbest hatin berdan. Ev malbet û çeteyên DAIŞ’ê ku di zindanê QSD’ê de bûn bi destê hikumeta demkî hatine berdan gelo ku de çûn anjî cihê di nava artêşa Sûriyê de girtine an na? Herwiha ew kesên ku ji kampa Holê hatine berdan li gorî dîmenên ku li ser dîjîyal medya hatine belavkirin daxwaza dewletek Îslamî dikin di heman demê de sembol û durişmeyên DAIŞ’ê li herêmên bin serweriya hikumeta demkî de hatin rakirin û ew kes di nava Sûriyê de niha jiyan dikin çawa û bi piştgirtiya kê? Kiwelisyona Navdewletî û Netewên Yekbûyî piştgiriya QSD’ê di operesyonên li dijî DAIŞ’ê dikir û bi operestona wan gelek serkirdeyên DAIŞ’ê hatin kuştin mînaka herî mezin xelîfeta DAIŞ’ê Ebû Bekir Elbexdedî bû. Herwiha wan QSD’ê weke hêza têkbirina DAIŞ’ê dîdît. Di heman demê de QSD’ê weke endamê fermî a kiwelisyona navdewletî li dijî DAIŞ’ê bû. Şerê harî dawî ya di navbera Hêzan Sûriya Demokratîk û hikumeta demkî a Sûriyê de li pêşiya kiwelisyona Navdewletî û netewên yekbûyî malbet  çeteyên DAIŞ’ê serbesr hatin berdan û helwesta xwe diyar nekirin gelo ev yek jî di plan di navbera Netewên yekbûyî û hikumeta Şamê de ye. Herwiha çeteyên DAIŞ’ê ku di zindana QSD’ê de bûn bi rêya netewên yekbûyî derbasî zindanên Îraql bûn gelo dixwazin dîsa Xelîfeya DAIŞ’ê zemîna Ebû Bekir Elbexdedî li Îraq û Sûriyê zindî bikin?

Em dîbînin çetetên DAIŞ’ê ku destê wan di hovîtî, kuştina sivîlan, revandina jinan û talankirina malên sivîlan mîna Mihemed el-Casim, ku bêtir bi nasnavê Ebû Emşê tê nakirin ku ji aliyê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ve jî ji ber binpêkirinên mafên mirovan di lîsteya sîstema sîzayan (Sancions) de hatibû bicihkirin, lê niha bi awayekî fermi ji aliyê hikumeta Sûriyê be weke Fermandarê lîwaya 62’an li parêzgeha Hama hatiye erkdarkirin. Di heman demê de Ehmed Îhsan Feyad el-Hayis ku bi Hatim Ebû Şeqra tê naskirin ku destê wî di şehîdxistin siyasetmedara Kurd Hevrîn Xelef (Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê) ku di sala 2019’an de li ser rêya M4 haye. Herwiha gelek binpêkirin û hovîtî bi sivîlan kir bi taybet li Efrîn, Serêkaniyê û girê spî kirine herwiha ji ber binpêkirinên mafên mirovan û tawanên şer, Ebû Şeqra ji sala 2021’ê ve di lîsteya sîzayan a DYA’yê (Amerîkayê) de ye ku ew jî niha ji aliyê Wezareta Parastinê ya hikumeta demkî ve wekî Fermandarê lîwaya 86’an hatiye erkdarkirin. Berpirsiyariya vê lîwayê li parêzgehên wekî Dêrezor û Reqa hatiye erkdarkirin. Herwiha ebû emşê û ebû şeqra herdu ji aliyê dewleta Tirk ve piştgirin. Lê li bermaberî wê serokê hikumeta demkî ya Sûriyê Ehmed El Şer di daxuyaniyek xwe de destnîşan kir ku Qaşo ew ê jî li dijî DAIŞ’ê şerbikin, lê em dibînim ku DAIŞ di nava hikumet û artêşa wan de cih digirin wê çawa şerê wan bikin û kengî?

Di dawiye de em dighêjin encamekê ku planek di nava Sûriyê, Tirkiyê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê DYA, Ukrayna, Îsraîl, Kendava Erebistan û Qatar bû, ku bi alîkariya wan êrişên li ser şêxmeqûd, Eşrefiyê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Armanc qirkirina Kurdan ji ber ku ku baş dizanim ew xwedî mafin dest ji doza Kurdî û herêmên Kurdî bernadin ev yek jî wê li pêşiya armanva wan bisekine. Ew dewlet dixwazin ku guhertina demokrafîk di Sûriyê de çêbikin her dewletek parçeyê xwe bibe ji berk u Sûriyê bi sererd û binerd dewlemende û di nava Sînora gelek dewletan de ye û bi taybet herêmên Kurdî. Ji ber vê belavbûna DAIŞ dûbarekirina sîneryoya xelîfeya îslamê ya Ebû Bekir Elbexdedî niha em dibînin.